

Li dawiya dawî Moltke yekemîn car dibe şahidê şerekî di navbera leşkerên tirk û Îbrahim Paşa de. Wekî ku Moltke bi xwe dinivîse, rewşa artêşa tirk gelekî xerab bû. Piraniya leşkeran kurd bûn û ew bi zorê anîbûn leşkeriyê. Hinek ji wan kurdan bi zincîran hatibûn girêdan da ku nerevin. Gelek caran, dema ku fersend çêdibû, leşker ji qada şer direviyan. Moltke di nameyên xwe de dide zanîn ku heke Hafiz Paşa guh bida şîretên wî dê tirk di şerê Nisibê (Nizîp) de neşikestana. Moltke pêşniyaz kiribû ku tirk bi şûn ve vegerin. Li gorî dîtina min, mirov divê li ser vê yekê baş lêkolînê bike. Lê dîsa jî ez dikarim bibêjim ku, qedera leşkeriya tirkan xuya bû; dê ew di wî şerî de her bişkesta. Ji ber ku rewşa artêşa wan, wekî Moltke bi xwe dinivîse, gelekî xerab bû.

Rûpel 8-9



Li gorî çavkaniya Helmut von Moltke
**Leşkerên Osmanî jî
ser û guan
kurdan jêdikirin**

Nûçe:

Şoreşa Kurdistanê
dibe Tirkiyeyî

Rûpel 3

Nûçe:

Destana şer û aştiyê
ji nû ve tê nivîsandin

Rûpel 15

Celalettin Yöyler:

Nanê gel dixwin lê
rastiyê jê re nabêjin

Rûpel 5

NAVEROK



4

Hevpeyvîn: Kana dengbêjiyê çelengî ye



6

Zana Farqînî: Hinek baldarî û hinek jî bêhnfirehî



13

Samî Berbang: Berhevoka kaniyeke bi çoş

Ji Xwendevanan

BERIYA her tiştî ez ji we re dibêjim merhaba û piştre jî silavên xwe ji we hemû xebatkarên Azadiya Welat re dişînim. Hevalên heja bi derketina Azadiya Welat ez pir kêfxweş bûm û bi qasî derfetên ku ji destê min tê ez hejmarên Azadiya Welat bê kêmasî dixwînim.

Lê belê gotineke min heye ji we re; ez dixwazim ku hûn giraniya nivîsên Azadiya Welat bidin ser şoreşê. Ji ber ku dilê me hemûyan bi şoreşê ve girêdahî ye. Dîsa silavê min û hemû hevalên ku li vê derê dijîn, ji hemû xebatkarên azadiya Welat re hene.

XWENDEVANEK JI BURSAYÊ

ENO di serî ra vîşer yo li Azadiya Welat waneno. Ferhengê ke Îzolî nûştio mi ey rey de kelîma ke mi nêzanay dey ra (ey ra) hewniyayîş reydi bander biyo (musa yo), ez nika weş eşkeno kirdasî bîwano.

Hetanî ke derheqî raştîniyê dimilî ser, di kombiyayîşê Stockholm nêbibi mi niwisê dimilî ra weş fam nêkerdinê, mi niwisê Lerzan Jandîl zî weş fam nêkerdinê. Kombiyayîşê Stockholm ra dima, mi hina xo da zaravaya xo ser û mi ay rojan ra wazeno ke şima hina zaf ca bidê. zaravaya ma. Sewk (ek) destê şima ra yeno, ez wazeno ke şima ca bidê niwisê Malmîsanîj zî.

Ez jîyanê şima di her îim serkewtin, panksarey û rîsipiyey wazeno. Homay xebata şima de, şima rê hetkarî bo.

SERDAR BEDIRXAN/AMED



sîrkê ar, denê xwe diterikîne

SAMÎ TAN

Siyasetmedaran tê xwestin ku her gava xwe bi pîvan bavêjin. Ev xisleta serêke ye ji bo kesên ku bîrpirsiya welatekî girtîne ser xwe. Lê dema mirov bala xwe dide rayedarên tirk, mirov dibîne ku ji vê xisletê bêpar in.

Xanim Çillera ku niha wekî seroka çeteyan tê binavkirin, guh da pistepista generalan û gel li hemberî mebûsên kurd tûj kir, pişt re jî got: "Ez PKK'ê ji meclîsê bavêjim!" Hinek ehmeqan jî gotin: "Belê!", paşê mebûsên kurd ji meclîsê hatin avêtin. Kesên ku ew kar kirin, pişt re tê gihîştin ku kevîr li gûzika xwe xistine. Hê jî dibêjin ku ew bûyer xeletiyêke mezin, rê li ber dîplomasîya kurd vekirîye; bûye sedema avabûna PKDW'ê. Niha hemû qelemşorên wan didin zanîn ku PKK li Ewropayê xurt bûye, êdî wezîrîtiya kurê derve di ber re nagihêje ku namêyên protestoyê ji dewletên ku heyetan kurdan dipejirin re bişînin.

Dîsa di sala 1993'yan de PKK'ê agirbesta yekalî daxuyand, lê rayedarên tirk îdia kirin ku PKK dixwaze bi vê gavê ji rêwşa xerab-ku ketiye navê rizgar bibe. Lewre li gorî wan PKK di warê leşkerî de têk çûbû. Lê paşê hate dîtin ku PKK'ê ji berê gelekî xurtir e, ji wê rojê heta niha bi hezaran kes hatin kuştin. Niha pisporên xwecihî û biyan didin zanîn ku ew agirbest şanseke bûye, lê ji dest çûye.

Niha MGK'ê hikûmeta Refahyolê ji ser kar danî xwarê. Generalên tirk berî ku vê yekê pêk bînin, qala guherîna konseptê artêşa tirk kirin, dan zanîn ku êdî, metirsiya mezin ne PKK ye, lê hêzên şerîatxwaz in. Generalên tirk ji bo ku hikûmeta Erbakan û Fînsû Çillerê ji ser kar daxê, çavên xwe ji hinek çepgirên rejîmparêz re şikandin, wan jî piştgirî dan vê xebata wan. Di ber re jî hevîyên pûç li nav gel belav kirin. Dan zanîn ku artêşê dil heye kêşeya kurd çareser bike, hinek gavên

demokratîk biavêje. Her tişt bi destpêkirina çalakiya "Trêna Aştiyê" diyar bû. Divê bê gotin ku berî vê çalakiyê jî helwesta neyinî ya hikûmeta MGK'ê sayî bûbû. Lê bi destpêkirina çalakiyên Trêna Aştiyê niyeta dewletê hîn zêdetir diyar bû. Piştî demeke bîdengiyê rayedarên tirk dest bi propaganda li dijî vê çalakiyê kirin, faşîst û kemalîstan jî ji milekî din alkariya wan kirin. Hatina trêne bi hevkarîya Tirkiye û Almaniyê hate berbendkirin, lê heyetên aştiyê hatin. Bi vê yekê re helwesta wan a neyinî tûjtir bû.

Piştî ku heyet ji Siwêreg hate vergerandin jî, êrîşkariya rayedarên tirk li hemberî heyetên aştiyxwaz kêm nebû. Di dawiyê de nehiştin ku kesên aştiyxwaz civîna çapemeniyê jî li dar bixin û ew bi awayekî hovane girtin binçav.

Qelemşorên wan ku niha li ser Leydî Dîana digirin, sibe roj wê dest bavêjin pênûsan û bidin zanîn ku wan derfeteke mezin heder kirine. Xuya ye ku rayedarên tirk zirtekerkî nêzikî meseleyan dibin û bi vê yekê jî didin peyitandin ku ew di karê xwe de ne şareza ne.

Lê gelo qelemşorên ku îro li ser Leydî Dîanayê destanan dinivîsin, di karê xwe de çiqas şareza ne?

Romana şoreşê

F. ZÊREVAN

Ji bo ku romaneke girîng bê nivîsandin, çi pêwîst e? Yan jî di nava van pêwîstiyên de kîjan pêwîstî herî girîng e?

Ya yekemîn mijar e. Divê ev mijar ji nav gel bê hîlbijartin ku tesîreke mezin li ser gel kiribe. Em gava bala xwe didinê bûyer pir bûne û mijar di destê me de amade ye. Wê kîjan nivîskar taqet bike û dest bavêje.

Ya duyemîn xwendevan in. Heger romanek hatibe nivîsandin ji bo xwendinê ye. Ji bo vê yekê jî gel yanî yên ku bixwînin, divê hebin. Dema ku romaneke heja hate amedekirin wê ji aliyê gel ve jî bê pejirandin û bê xwendin.

Ya sêyemîn nivîskar e. Ev nivîskar jî divê tîna şoreşê dîtibe û gel baş nas bike. Yên ku malên wan hatine şewitandin, yên ku koç kirine, yên ku nasên wan hatine kuştin, yan jî di girtîgehan de ne bi wan re bipeyive û şoreşê baş nas bike. Divê nivîskar bi wan re yeko yeko biaxive. Bi girtiyên şoreşvanan re bikeve têkiliyê. Lê belê serê her tiştî de cesaret pêwîst e.

Ya çaremîn ziman e. Wê roman bê nivîsandin, lê bê bi kîjan zimanî. Bi kurdî an bi tirkî? Li vir wê nivîskar bi dudilî bibêje: "Dema bi kurdî binivîsim wê xwendevanên min hindik bin û ro-

man wê pir neyê firotin, lê bê bi kîjan zimanî. Bi kurdî an bi tirkî? Dema bi kurdî binivîse wê xwendevan hindik bin û roman wê pir neyê firotin, ku bi tirkî binivîse, wê li ser rexneyên ne baş bînin kirin.

man wê pir neyê firotin, ku bi tirkî binivîsim, wê li ser rexneyên ne baş bînin kirin, wê bibêjin: "Tu çima şoreşa kurdan bi zimanê biyanan dinivîst?" Yeqîna me ev e ku bi zimanê zikmakî yanî bi kurdî bê nivîsandin wê çêtir be.

Pêşî divê romaneke baş bê amedekirin, paşê wergerînin tirkî, lê belê ku bi tirkî bê nivîsandin wergerê kurdî tiştêkî ne xweş e.

Ji bo mijara romanê ez dikarim mînakêkî binivîsim. Di sala 93'yan de li Hinzê, gundê Pasurê (Qulp) ku girêdayê Amedê ye. Serleşkerê Pasurê agahiyeke dişîne gund ku heta sibê divê kesek di gund de namîne. Lê belê ji bo ku dem kurt e, kesek ji cihê xwe nalebite. Serê şevqê leşker bi hezaran dikîşe ser gund. Her kesî jî malan derdixin û nahêlin kes tiştêkî ji malên xwe derxin. Di dolabê da pere, zêr û hwd. jî dimînin.

Ji gundiyan ên ku xwe davêjin erdê, yên ku digirin, yên ku hewar dikin. Lê belê feyde nîn e. Leşker belav dibin û


dest bi agirberdana malan dikin. Li wî gundî beriya çend rojan jineke bi navê Zelix e ku jinebî ye, perê xwe dide hev û bizineke xwe jî difiroşe û sarîncekê dikire. Ev jî nişke ve xwe ji destê leşkeran xelas dîke û dikeve malê, lê li tu tiştêkî nanerê. Ewil xwe davêje ser sarîncaxê xwe, lê belê çî feyd e agir ter û hişk tev şewitandine.

Xaniyên tevan tevî tiştên di hundir de jî dişewitin, dibin xwelî û dimînin. Xelk û gundî dimînin tût û rût. Heywan jî bi peşerava direvin dikin ore or. Leşker gundiyan jin û mîr, kal û pîr, zar û zêç tevî tînin dixin kersaxa çemê Qulpê (Pasûr) ji wan re dibêjin xwe ser devê bavêjin erdê, destên xwe bidin ser serên xwe. Bila kesek neçe destavê, yan na emê gule berî wan bidin. Bi vî awayî şev û rojêkî dimînin. Dotira rojê direvin tene Pasurê û dibin koçber û bi riyan metropolan dikevin.

Ev mînak ji hezaran yek e. Dema mirov li ser vê bûyerê difikire hişê mirov diçe.



Li Bakur, bi taybetî jî li herêma Culemêrg û Wanê çalakiyên gerîla zêde bûn. Di van du mehên dawîn de li navçeyên Wanê; Elbak, Şax, Gurpinar, Qelqelî û Kewaşê hêzên gerîla li dora 200 heb leşker û cerdevan kuştin, gelek jî birîndar kirin. Li wê herêmê gelek cih jî ketine bin kontrola gerîla. Bo nimûne Geliyê Gozel bi şev û roj di bin kontrola gerîlayan de ye. Roja 29'ê gelawêjê hêzêke mezin a cahşan ketin gelfî lê 4 heb windayî dan û destvala zivirîn. Gundê Killîsê yê bi ser Gurpinarê ve, piştî ku di 24'ê gelawêjê de lê 3 astubay û leşkerek hatin kuştin, roja 25'ê gelawêjê jî hêla hêzên dewletê ve hate şewitandin.



Li bo bîranîna Parlementerê kurd Mehmet Sincar ku di 4'ê rezbera 1993'an li Batmanê jî hêla kontrayan ve hatibû şehîdkirin, li avahi-yên HADEP'ê gelek çalakî hatin lidarxistin. Heyeta ku jî bo bîranîna şehîdên wê hefteyê çûbû Batmanê, malbata Metin Özdemir û Habib Kiliç ku berî şehadeta Sincar bi çend rojan hatibûn qetilkirin û malbata mele Zekî Adliğ ziyaret kirin. Roja 4'ê rezberê çûne Elma soka-kê ku bûyer li wê qewimiye qurnefîl danîn. Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik û Cihan Sincar jî axaftinek kirin. Di heman rojê de endam û rayedarên HADEP a Batman, Amed û Mêrdînê çûne Kiziltepeyê (Qezê) jî bo ku herin ser gora Mehmed Sincar.

NÛÇE

Şoreşa Kurdistanê dibe Tirkîyeyî

Berpîrsên kovara Alternatîfê bal kişandin ser rewşa pir-çandî ya herêmê û gotin ku dewletê jî bixwehesîna gelên gürcü, çerkez û laz ditirse jî ber vê yekê nexwaze PKK li herêmê xurt bibe. Berpîrsên kovarê wekî mînak jî da zanîn ku, gelek çerkez, gürcü û laz dibêjin em bi saya PKK'ê bi xwe hesiyan.

Her çiqas ev demeke dirêj e ku gerîla li Behra Reş bi cih bûnê jî, lê bi taybetî piştî kuştina du zarokên şivan rûdanên li vê herêmê di rojevê de cih girtin. Li aliyê din, gerîlayên PKK, DHKP-C û TKP-ML /TİKKO her ku diçe li herêma Behra Reş bihêztir dibin. Ji ber vê yekê hefteya rabûrî, Wezîrê Karên Hûndirîn Murat Başesgioğlu diyar kir ku, dewlet li herêmê li hin deveran desthilatdariya xwe winda kiriye. Ji bo ku ji nû ve bibe desthilatdar wê navçeyê bikin bajar. Li gorî ragihandina rojnameya Milliyetê, Wezareta Karên Hûndirîn bi navê "Plana Rizgarkirina Behra Reş" planek amade kiriye. Dîsa li gorî heman rojnameyê Wezîrê Karên Hûndirîn daye xuyakirin ku wê ew rê nedin ku PKK derbasî Behra Reş bibe, ji bo vê yekê jî wê walyên ku bi eslê xwe polîs in, bişînin herêmê.

Li ser rewşa dawîn ya herêmê me hin pirs arasteyî serokê ÎHD'ya Orduyê Firat Kargi kirin. Kargi li ser planên Wezîrê Karên Hûndirîn got ku, li herêmê hin nîşaneyên zelal yê desthilatnebûna dewletê hene. Wî her wiha bal kişand ser bicihkirina cerdevaniyê û da zanîn ku dewlet dixwaze tiştên ku li herêmê (Kurdistan) kirine, niha li vir jî pêk bîne. Li gorî daxuyaniya Serokê ÎHD'ya Orduyê, li navçeyên Aybastî, Mesûdiye, Gülköyü derketina zozanan hatiye qedexekirin û ev qedexebûn bicihkirina cerdevaniyê jî her ku diçe berfirehtir dibe. Li aliyê din, serokê ÖDP'ê yê Orduyê Şemsettin Yeşilyurt li ser heman mijarê da zanîn ku, gund li aliyekî, li bajarên jî kesên rastgir jî dewletê çekan dixwazin. Yeşilyurt li ser kirinên tîmên taybet jî wiha got: "Tîmên taybet bi kêfa xwe ne, li gorî dilê xwe digerin û derûdora xwe gulebaran dikin. Jixwe ev kesên ku wekî terorîst tên binavkirin tîmên taybet in."

Nameyêke nas

Wekî her caran, dewletê li hin bajarên

herêmê dest bi provakasyonan kiriye. Ev yek bi taybetî li deverên ku gerîla ber bi bihêzbûnê ve diçe tê kirin. Di nameyêke ku, ji Ordûyê jî me re hat şandin de, wiha hatiye nivîsin; "Piçên tirk yê bînamûs û bêşeref di nav 10 rojan de vê derê biterkînin û herin rojava. An na em PKK wê, bi piştgiriya Ewrûpî û Xiristiyanan we ji vir derbikin. Emê li vir Ermenîstaneke serbixwe damezrînin. Piştî me ev kir emê we biqelînin. Jixwe serokê me Apo jî xwerû ermen e. Ji ber vê yekê bêxem hemûyan qetil dike." Ev name li Ordûyê di televîzyon û radyoyan de hatiye weşandin û li heman cihan jî hatiye belavkirin. Wekî tê zanîn heman name, piştî bicihbûna gerîlayan li çiyayên Amanos û Torosan, li Hatayê jî hatibûn belavkirin. Lê li ber xurtbûna gerîla ne-bûbû asteng. Jixwe yekî ku vê bixwîne yekcar tê digihêje ku ew jî hêla hêzên dewletê ve hatiye nivîsandin. Kesên ku nivîsandine hay ji zimanê PKK'ê jî nûn in.

Rojev: Yekitiya şoreşa gelan

Digel van rûdanan, yekbûna şoreşa Tirkîye û Kurdistanê her diçe bêhtir di rojêva raya giştî ya şoreşger de cih digire. Wekî tê zanîn ji fermanarên ARGK Şemdin Sakîk, di bernamayeke MED-TV'yê de ku li ser 15'ê gelawêjê hatibû amadekirin, bal kişandibû ser pêwistiya yekbûna şoreşa Kurdistan û Tirkîyeyê û dabû xuyakirin ku di warê têkoşîna eniya Tirkîyeyê de kêmasiyên wan çêbûne. Ewê bêhtir giraniyê xwe bidin ser eniya tirkîyeyê. Heman katê de, roja 29'ê gelawêja 1997'an de Meral Kızır di rojnameya Ülkede Gündemê de li ser heman mijarê nivîsî û ev roj wekî rojên dîrokî bi nav kirin. Dîsa M. Can Yüce jî, di roja 31'ê gelawêjê de der barê vê yekê de wiha nivîsibû: "Gerîla derbasî Tirkîyeyê bû. Berê bi tenê li deriyên Anatoliya da, lê niha qulpên girîng bi dest xistine.



Tiştê ku berpîrsên şerê taybet dîn û har dike ev e."

Li Behra Reş pêlên şoreşê geş dibin

Gava ku mirov li dîroka Osmaniyan bikolê wê bibîne ku Osmaniyan jî bo ku Kurdistanê bi dest bixin pêşin herêma Behra Reş bi dest xistine. "Seferên Rojhilat" piştî bidestxistina Behra Reş dane destpêkirin. Ev stratejî berepaşî vê gavê jî bo pêkanîna şoreşa Kurdistan û Tirkîyeyê jî aliyê hêzên şoreşger ve tê bikaranîn. Tîrsa dewletê ya herî mezin ev e. Ji ber ku herêma Behra Reş jî her alî ve jî bo hêzên şoreşger gelekî baş û guncan e. Ev herêm miftiya yekbûna şoreşa Tirkîye û Kurdistanê ye.

Her wiha wekî ku berpîrsên kovara Alternatîf jî ji me re diyar kirin, li herêmê bingeha têkoşîna çepgir jî xurt e û gel hêzên şoreşger nas dike, di vî warî de xwedî ezmûn e.

Dîsa wekî ku berpîrsên Alternatîfê jî dan zanîn di vî warî de xala herî girîng stratejîkîna herême ye. Ji ber ku herêm wekî pîrekê Kurdistan û Tirkîyeyê bi hev ve girê dide. Xebatkarên Alternatîfê li ser vê babetê wiha berdawam kirin: "Bi cihbûna gerîla li herêmê belavbûna hêzên artêşa tirk e. Ev yek jî, digel bêhêzbûna artêşê tirk, bihêzbûna gerîla bi xwe re tîne. Ji ber ku eniya şer fireh dibe gerîla xwe baştir diparêze û vedîşêre. Li herêmê niha gelek gundên bêrê hene. Piştî vê yekê artêş nema dikare gerîla di

Kurdistanê de dorpêç bike."

Her weha xebatkarên kovarê bal kişandin ser rewşa pir-çandî ya herêmê û gotin ku dewletê jî bixwehesîna gelên gürcü, çerkez û laz ditirse jî ber vê yekê nexwaze PKK li herêmê xurt bibe. Berpîrsên kovarê wekî mînak jî da zanîn ku, gelek çerkez, gürcü û laz dibêjin em bi saya PKK'ê bi xwe hesiyan.

Dîsa berpîrsên kovarê li ser propagandaya dewletê ya li ser tîkçûyîna PKK'ê rawestiya û gotin gava ku PKK li vê herêmê çalakiyan li dar bixe, mirovên vê herêmê ku herî zêde mirovan dişîne leşkeriyê, êdî baweriyê bi dewletê naynin. Her wiha gava ku şer bandora xwe li vê herêmê kir, wê gel bi xeternakiya şer bihese, zarokên xwe neşîne şer. Dewlet jî ber van egeran, jî bihêzbûna PKK gelekî ditirse. Bihêzbûna PKK wê morala gelên din jî baş bike.

Berpîrsên kovarê derbarê bicihkirina cerdevaniyê de jî bal kişandin ku ser rewşa herêmê ya civakî û gotin ji ber li vê herêmê feodalî û eşîr tune ne cerdevanî bi hêsaniyê bi cih nabe. Wekî sedemeke din jî, ji ber ku gelê herêmê dikare bêyî kirina cerdevaniyê jî debara xwe bike. Lewre jî gel di warê cerdevaniyê de zêde ne dilxwaz e. Heman katê berpîrsên kovarê diyar kirin ku, ji ber ku tîkçûyîna gund û metropolan xurt û bihêz e bûyerên ku li gundan pêk tên yekser bandora xwe li metropolan dikin. Ev jî piştgiriya raya giştî xurt dike.

MAZLUM DOĞAN

Hevpeyvînek digel Baqî Xidir

Kana denbêjîyê çelengî ye

Dengbêj Baqî Xidir yekî ji yên me yî kevn e. Di her demekê de bablîsokek bi serê darekê dikeve, lê dar her tim di cihê xwe de dimîne. Di wan rojan de, di demên van bavan de, tunebûn, xizanî, perîşanî, nezani; bi merameke fireh, bindestiya wî dihişt ku, mirov, mirovê kurd xwe tune yî bibîne. Lê van camêran, xwe li pêş pêlên reş digirtin. Hêviyek tenê, di dilê wan de diperpitî ku, karibin çirûskêkê, di jiyana tune yîyê de, bipişkivînin.

Û piştî vî temenê dirêj, ji berxwedanê, ka em binêrin, çî bi serê wan de hat. Hunermend Cemîl Horo yek ji wan bû. Ew çû dilovaniya Xwedê teala, bêyî ku mele ji quretiya xwe dakeve û li xwe deyne ku, wî bişo û telqin bike, got: "Ew dengbêj û araqvexwar bû" û di derxistina laşê wî de du kes li pey cenazeyê wî nemeşyan. Mihemed Şêxo ji nav me bar kir û qîrîna xwe hişt: "Ay felek, te çima li me wa kir, te konê me, ji nav konan rakir..." Îro jî Baqî Xidir kesî li dora xwe nabîne.

Miletêkî mirî, nikare camêrên xwe vejîne. Kurd zarên xwe "Hunermendên xwe" dadiqurtîne. Lê dîsan jî, ew bêşûc e. Eger ku, damar ziwa nebin, dar wê her bimîne şîn. Ger çiqas jî pêlên reş, bi ser me de tî, lê hêvî wê her di dilên van camêran de, bêhna xwe li holê belav bike.

Min ji zû ve dixwest, wî bibînim û lê guhdarî bikim. Bihîstina min jê re, pir bîranînên xweş tîne bala min, rojên wînda, zarokatiya min tîne ber çavan. Naskirina min ji wî re vedigere berî bîst û pênc salan. Ez heft-heşt salî bûm dema ku bavê min kaseteke wî anî û me lê guhdarî kir.

Mîna her tiştên ne li bal, ji nişka ve, ez di vê demê de, li B. Xidir rast hatim. Kalemêrekî tenikdirêj e, di hest û qelafeta xwe de ye. Min xwest, ez her tiştên wî bibihîzim. Lê mixabin, wî zû bi zû, xwe bi dest min de ber nedida. Diviyabû ez fireh-fireh, li wî biqelazim. Û piştî pir kemendan, me karibû ew bixista xefika pirsan.

B. Xidir dengbêjekî kurd e, ji herêma Kobanê ji Kurdistanê Sûriyê ye. Yek ji dengbêjên me yî kevn e. Deng û şeweyek wî yê cihê heye. Belkî ev bin, tiştên ku em li ser we dîzanin. De ka hûn xwe bi xwendevanan bidin nasîn?



DENGBÊJ BAQÎ XIDIR Û PÎR RUSTEM BI HEV RE TÊNE DÎTIN

● Di "Sala Xelayê" de, ango sala 1920'an de, di gundê "Şêran" de, li Kobanê, ji êşîra "Ela-dîn" min çavên xwe, li ser dengê giriyê xwe vekir. Êşîra me koçer bûn û min, ji koçeriyê hez nekir. Piştî ku em hatin Kobanê ez bûm cendirme (polîs) ji hikûmeta Sûriyeyê re, di sala 1941'ê de, pişt re jî ez dibim cendirmeyê belediyeyê (zabita).

Di sala 1947'an de, min cara yekê, jin anî. Cara diduyan di sala 1955'an de bû. Heştdeh zarên min hene. Jê yanzêh law in. Yê mezin Evdelah, di şerê Libnanê de şehîd ket. Min pir hêşir û çend stran (kilam) li ser çêkirin. Min heya sinifa pêncan xwend û di pişt re ez bûm şivanê gund. Di demekê de jî bûbûm mele.

Stran, jiyan, çîrok û destan... û em karin hinekî bi pey hev û din. Gelo em dikarin bibêjin, ev gotin giş meramek wan heyê: Nemaze ji kesên dengbêj re, te kengî dest bi strana kurdî ya destanî kir?

● Berî her tiştî divê tu zanibî ku bavê min Xidir Hindawî dengbêj bû. Ev di cih de tîne bîra mirov ku, hê di zarokiya xwe de, ez ne dûrî strana destanê bûm. Min pirê wan, ji devê bavê xwe

girtibûn. Lê heya ew sax bû li jiyane bû, ez ne stiriya û wekî ku min di kurtejiyana xwe de da xuyanî, min demekê karê-şivantiyê kir. Ev yek jî û rewşa kesên şivan û tenêtiya wan, hişt ku, stran bibe hevalê min ê bi tenê.

Û piştî ku bavê te çû dilovaniya Xwedê, te ji ku dest pê kir. Ango derketina te ya holê çawa bû?

● Ez û Mihemed Xelîl Xazî (di salên 1950'an de) û Mihemed Gulî, li ser tembûrê em hatin bajarê Helebê. Li cem kemrîfonê (mikrofon), li ser sêlikan, me stranên xwe tomar kirin û cara pêşîn li Libnanê belav bûn. Ev bû despêka derketina min û pir karên din hiştin ku li nav min belav bibe.

Emê carek din, vegezin ser strana destanan. Çi ne stranên te yên bi nav û deng, eger tu karibî hinekî wan ji me re sayî (zelal) biki, ango temenê wan destanan, sedemên desketinên wan, dengbêjên wan...?

● Stranên min gotine û tomar kirine pir in û yek kare bibêje tev bi nav û deng in. Em karin çend heb ji wan bînin zimên:

Mîna: Hesenê Eli Begê, Salihê Na-

so, Binevşa Narîn û Cembelî, Hûseyin Begê Zilê, Delalê Edûlê, Memê Alan, Delalê Qereçî, Bê mal, Dilo⁽¹⁾ û Ewnî⁽²⁾

Ez dikarin bibêjim, stranên min ên bi nav û deng ev bûn. Wekî tu dibînî bêhtirê wan destan in û her yek ji wan dîrokek li pey dimeşe. Wek ku berî niha te got. Em dikarin hin mînakên bidim: Strana Dewrêşê Evdî, temenê wê 180 sal e, heft kat û nîvan (7:5) bi stranê gotin. Li ser şerê ku li nav eşîrên kurdan ji aliyekî ve, eşîrên tirk, ecem û ereban ji aliyê din ve. Mînaekeke din, strana Xezala Mendî⁽³⁾ jî ev 350 sal e ku tê gotin. Lê ji bilî vê yekê jî, hin stranên min ê xasma hene, digel alikariya hin sazbandan.

Hevoka dawî, pîrsekê tîne bala mirov. Gelo tîkiliya B.Xidir bi hunermend û dengbêjên hevde me wî û yê berî wî û di pey te re hatine çawa ye? Çi sîd ji wan wergirtiye. Nêrina we ji wan û berhemên wan re çawa ye?

● Berî her tiştî divê tu zanibî, di wan deman de wekî îro me nikaribû dengên xwe bigihanda hev û di rewşeke wekî rewşa vî miletî de. Lê dîsan jî ne qedexê bû ku em di pir tiştan de alî hev bikin.

Çi di komcivîna hin munaseban de û çî jî di derxistina klamekê de. Mînakeke biçûk; strana Cemîl Horo ya li ser nemir (M. Mistefa Barzanî), saz ji min bû û gotin û deng ji wî bûn. Lê bêhtir kêfa min, ji Mihemed Xelîl Xazî li ser kemençê, Cemîl Horo û Elî Tîco re dihat û ji dengbêjên kevn ên ku, min sût jê dîtine Xidir Hindawî û dengbêj Mişo Bakîr in.

Û yên vê demê?

● Îro ne wekî berê ye. Dengbêj, saz-bend pir bûne û piraniya wan jî nas nakim. Lê bêhtir kêfa min jî Mihemed Şêxo û S. Resûl re tê.

Ger ku, zarok negirî, dê memikan nexine dêv. Çi dihêle ku yê dengbêj, dest têxine bin guhê xwe û "Heylo kîlaman bike." ango ev tişt, çirûsk, hesta ku dihêle ku dilê hunermend bê kizirandin û qêrîna wî biteqe çî ye?

● Bi tenê çelengî ye. Sipehîbûn û çelengiyan jinê (pîrek) dihêle yek staranan saz bike. Te dîtiye kesî li ser yeke kor saz kiriye. Lê divê ew kes dûtî, şeref û namûsa xelkê here, wan neynê ser zimanan. Carekê min jî Cemîl Horo re got: "Çê nabe ku, yek li ser namûsa xelkê bistire" û min da ber çavên wî ku çawa carekê li bajarê Efrînê kirin ku, wî bikujin. Lê Xwedê kir em tev hazir bûn û me ew jî nav destan rewand. Bila tu zanibî ku eger jin di civatekê de rûniştîbin, ez nikarim saz bikim, ev jî şerman e. Di vî warê de pir caran min xwe êşkere nedikir.

Tu bi xwe hatî ser vê yekê. Pîrek di

Stranên min ên bi nav û deng wekî tu dibînî bêhtirê wan destan in û her yek jî wan dîrokek li pey dimeşe. Strana Dewrêş, temenê wê 180 sal e, heft kat û nîvan (7.5) bi stran tê gotin. Li ser şerê ku li nav eşîrên kurdan jî aliyekî ve, êşîrên tirk, ecem û ereban jî aliyê din ve. Mînakeke din, strana Xezala Mendî, jî ev 350 sal e ku tê gotin.

jiyana B.Xidir de, bi çî rolê rabû, heya bi kîjan derencê, pîrekê tu qels û tune-yî kirî an jî tu derxistî kîjan asûmanî?

● Wekî ku min berî niha got, pîrekê hişt ez bibim dengbêj. Erê ez gelekî fedyokî bûm. Lê vê yekê nehişt ku, ez ji sîh û heft (37) keçikan hez nekim. Lê bi yekê re jî neçûm serî. Belkî te çîroka min û keçika ku tiff ser min kirî, bihiştîye. Di demên ku, ez şivan bûm de rojekê min pez bi aliyê qeraxa Çemê Ferrat ve alda. Ez li ser timbekî (girê biçûk) rûniştim û min kurkê xweyî bî pêncsed cih hatî perispankirin (pînekirin), li xwe pêça. Sibeheke biharê bû, rojek zelal ji pişt çîyan ve derket û di wê navê de, qeflek (refek) qîzên gund, ber min de hatin. Min jî dest xistibû, bin guhê xwe û min dest bi stranên kiribû. qasek(hinek) çûn, pez wînda bû, roj hat nîvro. Lê keçik ji cihên ku, tê de rûniştîbûn nelivîyan û gava min bîr bir ku, pez bi carekê wînda bûne, min dev ji stiran gotinê berda. Diviyabû ez di nêzikî wan re biborim. Dema ez nêzikî wan hatin, yekê bi tîjî dengê xwe got, hişt ku ez bibihîsim: "Wey xwelî li serê me be, ev deng ji vê qelafetê dihat....

tiff!" Ji ber vê yekê ez dibêjim heger ku hûn dixwazin min nas bikin, ji paş ve li min binêrin.

Em hinekî nêzikî birîna rojane, birîna kefnîkî bibin. Tu û politîka, tîkîliyên te bi partiyên kurd re çawa ne. Bi hin kesan re li ser kurdîtiya xwe çawa dixavî?

● Berî her tiştî ez dixwazim bibêjim ku bav û kalên min ereb in, ji eşîra Gêsiyan in, ji herêma Heranê ne. Lê bavê min bixwe jî, zimanê erebî ji bîr kiribû.

Tu xwe çawa xwe dihesibîni?

● Ez xwe kurd dihesibînim. Lê mixabin, ne kurd min qebûl dikin, ne jî ereb. Careke din mixabin ku, em bes bi navê xwe kurd in. Çima Mesûd Berzanî û Celal Talabanî li hev nakin. Partiyên me ne sax in û dixwazin nesaxiya xwe berdînan nav millet û berdîdan jî. Kê got Newroz ya partiya ye, heya ku her yek bixwaze, parekî ji vî milletî, bi ser xwe de al de. Her yek çavên wan li kurdîtiyê ye (danîştok) lê dîsa jî ez bi yekbûna wan re me. Dîsa mixabin, kesî durust di nav wan de tune ye.

Û şaxê duduyan ji bo pirsra te, ez dibêjim stranên min gotine bersiva wê dîdin. Ji zû de, ez carekê derketim Tirkîyeyê di dema Kenan Evren de bû. Li bajarê Dîlûkê (Entabê) em rûniştîbûn, di civînê de yekî gote min eger ku, çengelê MÎT ê bi ber te keve, wê te bişînin Amedê, lê min dest xist bin guhê xwe û min heylo Dewrêş kir.

We kes nehişt, ma kurd tunene?

● Kurdên heqîqî (rast û durust), ên ezîdî ne.

Pirseke bi lez û belkî a dawî be jî. Strana ku, te dixwest ku tu her tim bibêjî?

Strana "Êmoya Êlê" ye.

● ...û wê gavê dest danî bin guhê xwe û dest bi stranê kir. Piştî ku, hinekî kela xwe rijand û bê deng ma, min jê re got "Gotina te ya dawî?" Wiha gote min:

"Em bê xwedî ne"

Pîr Rûstem/ Cindîrêş-Başûrê Biçûk

Têbinî:

1-Her du stranên dawiyê, yên wî ne. Çi ji aliyê gotin, saz û bi dengê wî belav bûne.

2-Ev kes (Ewnî) li Tirkîyeyê konsolosekî cihûyan dîkuje û ji ber vê sedemê direve tê Sûriyeyê. Lê belê li wê derê tê girtin.

3-Ji bo gotina "Mendî" mirov dikare bi-bêje mend, li gofî wergera Tewratê, ji bo milletê Medya jî beriya zayîne ve mend tê gotin.

HEVPEYVÎN: PÎR RUSTEM

Nanê gel dixwin, lê rastiye jê re nabêjin

CELELATTİN YÖYLER



Girîngiya bandora olan li ser kesên bawermend bi du tîp û beşan e. Yek erênî, ya din jî neyinî ye. Lê bi bawerîya min a li ser hûrnêrînen zanistiyên olî, di taybet û bingehên olan de bandorên neyinî, tune ne. Kesên bawermend ên paşverû, wê rewşa neyinî, bi nezanî û qirêjîyên mejiyên xwe, diafirînin. Gelo kî ne? Ewên ku bi navê bawermendîtiya olî, bandorên xwe yên xerab û nelirê datînine ser kesên bawermend ên nexwendî û wan ji rîya tîkoşîna mirovatiyê dûr dixin? Ewên ku ol û misil-mantiyê di reng û rewşên cil wergirtinan de dibînin ew in. Wekî wergirtina şaşik û cube, ya tîzbî, miswak û şalvar. A ewên ku bi wergirtinên "ferîştayan" û bi dilên pelîdî (şeytanî) dema ku li civatên kesên bawermendên nexwendî rûdînin û ji wan ji hêla kesên wê civatê ve pirsên civakî û mirovahî tîne pirsîn, ew xwe wekî zanayên olnas didine nîşan û dest bi fetwayên beropaş dikin û wê civata nexwendî ya belengaz dixapînin. Wekî çawa yek ji wê civatê dibêje: "Mamê

seyda an kekê Şêx gelo serhildana Şêx Seîdî Pîranê bi awayê ola me, misilmanan çawa bû?" Ew mam an kek xwe dinepîxîne û ji civatê re dibêje: "Gelî birayên bawermend, ji bo wê serhildanê "Bedîûzeman Seîdê Nosrî" ji kesên wê demê re, gotiye: "Şûr li hemberî wan kesên ku neviyên osmaniyan in, hem jî kalikên wan hezar sal jî îslamiyete re xizmet kirine nayê kişandin." Dîsa jî di civatan de ji wan kesan, dipirsîn û dibêjin: "Seyda an şêx, ew kesên ku tîkoşîne jî bo rizgariya neteweyî didin tu ji wan re çî dibêjî? Ew dibêje: "Ewên çepgir bê limêj in." Gelî xwendevanên hêja ev e bandora neyinî ya ku jî mejiyê kesên bi navê olperestiyê bi derewan derdikeve holê. Lê em baş bizabin ku ew ne ol e. Ol tîkoşîna "Mihemed, Îsa û Musa ye" li hemberî bédadiyê û kevneperestiyê. Bandora olan di warê erênî û neyinî de li ser kesên bawermend, wekî bandora "molekûlên atomî ye" li ser giyaneweran. Bi zanîna min hêj ji bandora "molekûlan bi hêztir e. Lewre "atomê" li Nagazîka û li Hîroşîmayê li dora şêst hezar kes tune kir. Lê bandora neyinî ya olî ku ji aliyê kesên bi navê olê bi paşverûtî li ser kesên bawermend dimeşînin, ew ne wekî tevkujiya Hîroşîma, Negazîka û Helebçeyê ye. Ew tevkujiya bi milyonan mejiyên kesên bawermend e. Ew, kerkirin, lalkirin, korkirin mirovan û dûrxistina wana ji rîya

tîkoşîna ji bo cur bi curên mafên mirovahiyê ye.

Lê heke ol bi rastiya wî ya xwedayî ji bawermendan re bête şîrovekirin û bandora wî ya erênî bête diyarkirin, dîsa ew bandora ji "parçekirina atomê" karîger-tir e ji bo pêşveçûna kesên bawermend û bi rûmet re. Wekî bandora wî ya di demên tîkoşîna "Muhemmed û Musa" de (silava Xwedê li ser wan be.)

Pir mixabin bi destpêka dîroka îslamê heta vê demê, rastiya ola îslamê ji gelê kurd re nehatiye gotin. Her tim bi mêtîngeriya olê hatine xapandin, kuştin û talankirin. Bi hezaran tekiye û terîqet, şêxtî û murîdî li ser qad û axa Mezopotamyayê hatine damezrandin. Van rêxistinên olî her yekê ji xwe re, hêzên mezin dane hûnandinê û xebitandin. Hem jî tu demê ji bo serfirazî û serbilindiya gelê kurd rêberî û şêxîti nekirine. Hem jî çîrokên firîn û xenîmbûnên xwe yên kevneperestî ji gelên kurdên reben re derxistine holê û wan, bi xenîmbûn û çavkorkirinê dane tirsandinê û vecinîqandinê. Îro jî em dinîhêrin ku xwîna gelê kurd wekî kaniyan diherike û dikişe. Lê ji bo navê Xwedê yek ji wan şêx û murşîdên ku bi sedan salan nan û kar berxên vî gelî xwarine, rojekê nabêjin: "Xwezî xwîna wan nerîjiya." A yên ku vî gelî bi sedan sal bi navê dîne îslamê xapandine ev in.....

Hinek baldarî û hinek jî bêhnfirehî

Ciwan Haco di hevpeyvîna xwe ya ku di hejmara 68. a Welat de (bi mêjûya 6 - 12 Hezîran) hatiye weşandin de, muzîka ku çêdike bi navê "Muzîka kurdî ya nûjen" binav dike. Her wiha Haco di hevpeyvîna ku di kovara Rollê de derketiye, ji albûma xwe ya bi navê "Mirina Egîdekî" behs dike û wê wekî xebateke "etno-caz" bi nav dike. Der barê naveroka kaseta "Sî û Sê Gulle" de min ev nivisandibûn. Ez wan jî vediguhêzim vir.

ZANA FARQÎNÎ

Kovara "ROLL"ê, di hejmara xwe ya dehemîn de (gelawêj '97) cih daye hevpeyvîna bi Ciwan Haco re. Hevpeyvîn ji aliyê Osman Mehmed ve hatiye kirin, bi navê "Gül ve reyhan kokuyordu" (Gul û rihanan bêhn didan).

Ez bi xwe ne xwendevanê vê kovarê me. Bi saya hevaleyê haya min ji vê hevpeyvînê çêbû. Heman hevalî gote ku, "Ciwan Haco tê de rexne li te girtine". Min ev hejmar jê xwest. Heftiyek pişt re kovar ket destê min. Min ew hevpeyvîn xwend. Bi rastî, gotinên Haco yên der barê min de, ez heyirandim. Dest û piyên min bi erdê ve zeliqîn. Min biryar da ku ez bersivê bidimê.

Beriya ku ez bersivê binivîsim, min xwest ku ez li kasetaya ku hevpeyvîn tê de hatiye tomarkirin, guhdarî bikim. Çimkî hevpeyvîn bi kurmancî hatibû kirin û pişt re jî li tirkî hatibû wergerandin. Ji bo vê yekê em çûn navenda kovara Rollê, lê çî heftî ku ev daxwaziya me nehate cih. Em jî neçar man li gorî gotinên ku di kovarê de derketine bersivê bidine Ciwan Haco.

Li ser pirsra "Hûn rexneyên der barê muzîka xwe de çawa dinixînin? Tê gotin ku hûn muzîka kurdî ya gelêrî xera dikin..." Ciwan Haco bersiva jêrê dide:

"Çend caran Zana Farqînî muzîka min rexne kir -çendî ku zêde pê de çûbe jî... Mesela, gava ku Zana Farqînî gotinên wekî 'Bi kurtî di muzîka Ciwan de tiştê nîn e', û heta der heqê qirînen min ên di "Diyalog", "Gund û Bajarên Çadîrî" û "Generalê Tirsonêk" de 'Ez ne bawer im ku yê van dibêje kurd be' serf kirin, pir şaş bû. Pêwist e ku zîhniyeta xwe ya der heqê muzîkê de biguhêre. Muzîk di cihê xwe de nasekine. Yanê, em nikarin wekî Mihemed Arîfê Cizrawî bibêjin, wekî Hesên Zîrek bibêjin. Muzîk jî diguhêre. Eger muzîk di cihê xwe de bimîne, wê bimire. Muzîka kurdî jî tu car di cihê xwe de nemaye û ya rast jî ev e..."

Me ev paragraf ji tirkî wergerande kurmancî. Lê xwezî eslê van gotinan di destê me de hebûya.

Em ji berêvkî de dest bi bersivên xwe bikin. Yek, heta niha min tenê carekê li ser xebatên Ciwan Haco nivîseke nixandîni nivisandîye. Ev nivîs jî di hejmara 66. a Welat de (bi mêjûya 23 - 29 Gulan 1993) hatiye weşandin. Bi navê "Qaseta Sî û Sê Gulle û Nûjentî". Bêlê, çar sal berê min carekê li ser xebatên Ciwan Haco nivîsiye, ne çend caran.

Dudo, wekî ku ji navê sernivîsê jî xuya dibe, ez li ser nûjentîya di warê muzîka kurdî de rawestiyabûm. Min tê de gotibû ku mirov kîjan komî (an jî kesî) dileqîne, yekser dibêjin ku armanca wan

pêşvebirina muzîka kurdî ye û ew bi xwe jî, muzîka kurdî ya nûjen çêdikin; lê belê rastî jî ev e ku piraniya wan muzîka kurdî nas nakin. Heta başbaş agahiyên wan ji têgînên (terfîmên) di muzîkê de wekî yên hemdemtî, nûjentî, gerdûnî û cihanîti û hwd. nîn e. Belkî hevoka "ji cihîtiyê (lokalîyê) ber bi cihanîyê ve" tenê ezber kiribin û hew.

Ji vir pê ve, em serî li wê nivîsa xwe bidin û hin beşên wê veguhêzin vir; bêyî destdanê:

"Tevlihevî û gelemşê di warê muzîka hemdem, nûjen de heye. Her gel, netewe ji aliyê muzîkê ve xwediyê taybetîyan e. Pîvan, rîtm, teşe (form), melodî, armonî û heta dengê navber (dengê komal) taybetiyên herî girîng in.

Mînak di muzîka Ewrûpî de dengê navber ango komal nîn e. Lê di muzîka Kurdî de heye. Ji aliyê din ve di hin meqamên Kurdî de, wekî hîcaz, dengê navber nîn e.

Heke em li gorî tespîtên jorê li qaseta Sî û Sê Gulle ya Ciwan Haco binêrin û tevî xebatên wî yên din, em dê bibînin ku bi temamî ji muzîka Kurdî ya hemdem û gerdûnî dûr e. Em nikarin xebatên wî tevî wê qaseta wî wekî muzîka Kurdî ya nûjen binixînin. Ji ber ku ew senteza muzîka Kurdî çêdike."

Muzîka kurdî pir li paş maye, sedem ji me tevan re eyan in. Pêwistî bi pêşvebirina muzîka me heye. Ev pêşvebirin jî, bi ya min li ser taybetiyên muzîka me çêdibe. Çimkî em behs ji muzîka kurdî ya nûjen dikin. Divê ez hin tiştan bibîran bixim. Îro dinya bi gelemperî muzîkê dike du beş:

Muzîka cihanê û muzîka cihana seyemîn. Pop, rock û caz mîna muzîka cihanê (world music) û muzîka ku li welatên cihana sisîyan tê çêkirin jî, wekî etno - muzîk (etno music) tê binavkirin.

Ji ber ku Ciwan Haco di xebatên xwe de rîtm û formên muzîkên wekî rock, caz, blues, pop pir derdixe pêş, me navê muzîka sentez jê re guncaw (munasib) dît. Bi rastî jî Ciwan Haco xwe bi qalîbên muzîka kurdî ve girê nade.

Endîşeyekê wî ya wilo nîn e. Haco di hevpeyvîna xwe ya di Rollê de diyar dike ku ew naxwaze wekî muzîsyenekî kurd, lê tîne nolî muzîsyenekî bê bibîranîn.

Ji hêla din ve, di wê nivîsa me ya navbihurî de em li ser başbûn û nebaşbûna xebatên wî nesekinîne. Tenê me nav li xebatên wî daniye. Dîsa em ji wê nivîsa xwe paragrafêkê hildin:

"Ev qaseta wî jî, hem ji aliyê bikaranîna amûrên (enstrûmanên) muzîkê ve û hem jî, ji aliyê teşe, rîtm, melodî û pîvanê ve xwerû ne Kurdî ye. Senteza muzîka Kurdî û Ewrûpî ye. Di hin parçeyên xwe de em dikarin bibêjin ku giyana muzîka Kurdî ya hemdem qefaltiye. Ango li ser taybetiyên muzîka Kurdî parçeyên xwe afirandine. Mîna parçeyên 'Tu Ciwan' û 'Diyarbekir' lê parçeyên din ne wisan in. Di wan de bêhn û tama rock, pop û cazê û hwd. xwe bi hêsaniyê didin der. Guhdar zû bi biyanîbûnê dihese.

Ev jî heye ku tembûr, mey, ney û flût car caran biyanîtiyê ji navê radike û nasbûna xwe bi bîra guhdaran dixê."

Me gotiye ku ew muzîkeke sentezî çêdike. Me wê çaxê kasetên wî yên ku me ew guhdar kiribûn, dabûn ber çav û wisa ev gotin serf kir. Eger bi çavekî nixandîni li xebatên wî bê mêze kirin, wê bê dîtîna ku Haco her

diçe ji formên muzîka kurdî dûr dikeve û bi formên "world music" muzîka xwe îcra dike. Ez ji bo îro dibêjim ku, Haco hinek tehm û bîna muzîka kurdî dixê nav cureyê muzîkê yên wekî caz û rockê.

Ez hewce nabînim ku gotinên din li van gotinan zêde bikim. Tenê em çend gotinên Ciwan Haco ji hevpeyvîna wî ya di Rollê de veguhêzim vir wê bes be; ku ew di der barên lêder û sazbandên amûran de ne:

"Muzîk tiştêkî enternasyonal e, ez carekê jî naçim ji wan re 'Wiha lê bixin' nabêjim. Jixwe heqê min jî tune. Lê ez pêşî stranê çêdikim, radihêjim saza xwe ji wan re lê dixim, eger li xweşa wan here 'Ev parçe baş e' dibêjin. Pişt re em diçine studyoyê. Li studyoyê jî em serbest dixebitin. Carinan em li hev nakin, lê di encamê de li cihekî em digihîjin hev."

Ciwan Haco di hevpeyvîna xwe ya ku di hejmara 68. a Welat de (bi mêjûya 6 - 12 Hezîran) hatiye weşandin de, muzîka ku çêdike bi navê "Muzîka kurdî ya nûjen" binav dike. Her wiha Haco di

hevpeyvîna ku di kovara Rollê de derketiye, ji albûma xwe ya bi navê "Mirina Egîdekî" behs dike û wê wekî xebateke "etno-caz" bi nav dike.

Sisê, der barê naveroka kasetaya "Sî û Sê Gulle" de min ev nivisandibûn. Ez wan jî vediguhêzim vir:

"Qaseta Sî û Sê Gulle ji aliyê naverokê ve ji demê ne dûr e. Bersiva demê dide û naveroka parçeyan xurt in."

Çar, Ciwan Haco tewqa (teklîfa) guherandina zîhniyeta min a der barê muzîkê de, li min dike. Min dawîya wê nivîsa xwe bi van gotinan anîbû:

"Digel her tiştî xebatên wiha bi wêrekî girîng in. Tu tişt di şûna xwe de namîne û diguhêre. Divê em çeperan li dora xwe neafirînin û wan li xwe teng nekin. Lê her xebat divê bi zanebûn were kirin."

Em ne xwediyê wê baweriyê ne ku muzîka kurdî tenê divê bi saz û zirneyê bê îcrakirin. Li hêla din, em ne qayil in ku bi navê nûjentî û hemdemtîyê dengê navber (dengên komal) jî ji muzîka me bînan derxistin. Çawa em nikarin tenê bi sazê vals bigirin, halo jî em nikarin li ber piyanoyê govendê bigirin. Li vir ez gotinên Prof. Celîlê Celîlê vebêjim. Di sohbetekê de ji me re wiha got:

"Xwişka min Cemîla li ser muzîkê dixebitî. Kêfa bavê min pir jê re dihat. Bavê min li fiqê dixist. Melodiyên kila-man xweş derdixist. Cemîla dikir nedikir bi piyano ew melodî demediketin. Bavê min hêrs bû, got:

- Ez bi fiqê derdixim, nizam çend qulên wê hene, lê tu bi piyano nikarî, ka binêre çend ewkên wê hene..."


Ez pêdivî dibînim ku ez van gotinan jî bibêjim. Ne tenê di muzîkê de, di hemû warên hunerê de ez bi serbestbûnê bawer im. Bi gotineke din ez qenc têgîhiştîme ku huner bi sparîşê çênabe.

Çawa, kî bi çî rêbazî rabe serbest û aza be, wisa guhdar û temaşeger jî mafdar in ku wê berhemê bicibînin an ne. Her wiha, kî çî navî li xebatên xwe bike, ez gerek dibînim ku mirov bi wî navî nêzikahî di wê berhemê û karpêkê bide, wan binixîne.

Xaleke pir girîng; gelê me di demeke ne-asayî (anormal) de dijî, ev rewş gelo dikare neyê dîtî? Erk û vatîniya me tevan e ku em lê bixebitin da ku rojek berî rojekê gelê xwe bixin rewşa asayî. Ez dibêjim qey ji aliyê tu kesî ve yekalîtiya têkoşînê jî nayê parastin!..

Gotina dawî; helwesta Ciwan Haco ya siyasî jî pir balkêş e. Gava mirov hevpeyvînen wî yên din û ya di kovara Rollê de dide ber hev, mirov ji xwe re şaş û metel dimîne!.. Gotinên wî qet naçin ber hev.





- 06.09.1975: Li Liceya Amedê hezekeke zezela mezin çêbû.
- 06.09.1938: Tevgera komara tirk a çaremîn li hemberî serhildanê Dêrsimê dest pê kir.
- 07.09.1982: Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê Kemal Pîr, li Zîndana Amedê, di rojîya mirinê de kete nava karwana pakrewanan.
- 08.09.1949: Bestekar Strauss çû ser dilovaniya xwe
- 09.09.1984: Hunermend û sinemavanê kurd Yılmaz

- Güney, li paytexta Frensa Parisê çû ser dilovaniya xwe.
- 10.09.1982: Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê M. Hayri Dürmuş, li Girtûgeha Amedê di rojîya mirinê de şehîd ket.
- 11.09.1961: Li başûrê Kurdistanê li dijî rejîma faşîst a Iraqê serhildanê dest pê kir.
- 11.09.1973: Serokê sosyalîst ê dewleta Şîliyê Salvador Allende ji aliyê cuntayê ve hate kuştin.
- 12.09.1982: Li Tirkîyeyê cuntaya faşîst dest danî ser rêveberiyê, Kenan Evren bû serokê dewletê.

AWIR

Pêşwaziya heyetên aştiyê



Bereyaji helwesta neyinî ya dewleta tirk, gelê kurd heyetên aştiwaz bi dilekî geş, berhembêzkin. Bi vî yekê hate dîtin ku faşîst û nijadperestên tirk ne, lê gelê kurd û azadîwazên tirk mêvanperwer in.

Piştî ku Trêna Aştiyê ji aliyê dewleta Almanya ve hate qedexekirin. Heyetên aştiyê jî bi rîya balafrê xwe gihandin Tirkîyeyê. Li Tirkîyeyê jî ji aliyê welatparêz, rewşenbîr, sendikawan ve bi dilekî ços hatin pêşwazîkirin.

Roja inê ango roja 29.08.1997'an ji bo vî heyeta aştiyê ku ji mebus, sendikawan, rojnamevan, parêzkarên mafên mirovan pêk dihat ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamyayê ve çalakiyekî şahiyê hate lidarxistin. Berî konsera Koma Amed Serokê Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen axaftinek kir. Wê di axaftina xwe de li ser vî nêzîktêdayina Hanowerê û endamên wê dilxweşiya xwe pêşkeş kir û da zanîn ku kurd bi salane bindest in, ji talankirina bigirin çî bê bîra we bi kurdan hatiye kirin. Nuray Şen di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku alman bi zimanê xwe diaxivin, zarokên xwe bi zimanê xwe perwerde dikin, lê ku kurd dema dixwazin bi zimanê xwe zarokên xwe perwerde bikin, bi bombeyan bi tevkujîyan bersiv tê dayîn.

Piştî axaftina Nuray Şen, jina şehîdê nemir Apê Musa, Hale Anter jî bi dilekî ços, lê bi madekî xemgîn ji bo vî çalakiya aştiyê spasîyê xwe pêşkeşî beşda-

ran kirin.

Piştî van axaftinan Koma Amed bi stranê xwe Koma Şanoyê ya Kayderê bi listika xwe li ser wateya 15'ê gelawêjê tekoşîna gelê kurd rawestîya.

Piştî vî çalakiya li NÇM-roja şemiyê 30.8.1997'an ev heyeta Aştiyê çû serdana malbatên koçber yên ku ji Kurdistanê hatiye koçkirin. Ev neyete li gelek malên kurdan bi çosêke mezin hatin pêşwazîkirin. Li ser vî reşwa kurdan heyetên biyan jî diyar dikirin ku, ew ji bi wan re ne hetanî mirina xwe be ji ewê li ser vî rewşê rawestin. Roja pençşemî 28.08.1997'an jî heyeta aştiyê nêzîkî 50 kesî hatin serdana me. Di vî serdanê de heyeta aştiyê li ser rewşa rojnameyê û astengiyê li ber xebata me agahî girtin. Bi taybetî pîrsa wan a li ser hejmara xwendevanên zimanê kurdî balkêş bû. Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan digel agahiyên pêwîst ên li ser rojnameyê, da zanîn ku dewleta tirk naxwaza ku rê li ber geşbûna zimanê kurdî vebe, lewre jî li ber kursên bi zimanê kurdî dibe asteng. Her wiha Tan diyar kir ku dewlet dixwaze rojnameya Azadiya Welat di warê aborî de têk bibê, lewre jî rê li ber belavbûna rojnameyê digire.

AZAD ZÊRO

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Yado kî bû?

Yado ji Paloyê bû. Ew ne axa û ne jî serokeşîr bû, lê xwarziyê mala mîr bû. Mêrekî jîr û leheng bû. Di sala 1925'an de, dema Şerê Şêx Seîd dest pê kir, Yado jî beşdarî vî şerî bû. Wî di demekê kurt de, bi mêranî û çalabûna xwe nav û deng da. Di şerê Şêx Seîd de, Yado bû fermandarê eniya Xarpêtê. Wî bi şerekî giran bajarê Xarpêtê girt. Yado û Şêx Şerîf fermandariya serhildanê dikirin. Dilsarî û dijberî di navbera Yado û Ş. Şerîf de derket û hev û du tawanbar kirin.

Piştê artêşa tirk bi hêzeke giran bi ser bajarê Meletiyê ve êrişê Elezîzê kir. Hêzên Yado û Şêx Şerîf nikaribûn li Xarpêtê pêş li artêşa tirk bigirin û li hemberî wê li ber xwe bidin. Ew bi paş ve kişiyên û hatin navçeya Paloyê. Artêşa tirk êrişî Paloyê kir. Li Paloyê şerekî giran û dijwar daket. Eskerên Şêx Şerîf belav-welav bûn. Şêx Şerîf jî di şer de birîndar bû û ji qada şer revî. Piştê tirkan ew di şikeftê de girtin û birin bi dar ve kirin.

Lê Yado, bi mêranî cih û kozika xwe ya şer berneda û li hemberî dijmin ling da erdê. Wî bi qehremanî li dijî tirkan şer kir. Tirkan dor lê girt. Şerekî dijwar û bêbav çêbû. Di dawîya de Yado bi hevalên xwe ve êrişêke giran û dijwar birin şer kozik û çepêrên tirkan. Tirk di zorê de man ji wan re rê vekirin û Yado û hevalên xwe ji nav dorpeça tirkan rizgar bûn û derketin der. Yado wiha çend mehan li çiya ma. Gelek caran şer di navbera wî û hêzên Yado u leşkerên tirk de derket. Piştê bi çend hevalên xwe ve lîxist çû binxetê, yanê Sûriyê. Bi qasî salekê li bajarê Heskê ma.

Yado nikaribû li Sûriyê wek şerekî bend û qefesrîrî bimîne. Ew bi Ermeniyekî re vegeya Tirkîyeyê. Yado li nêzîkî bajarê Amedê rê li pêş posteya tirkan girt. Dest da ser pere û eşyayên dewletê û ji memûrên wan re got:

– Here ji Mufetişê Umûmî re bibêje ku wa ye Yado dîsa hatiye.

Mufetişê Umûmîyê wê demê wekî waliyê dagîrkerê niha ku li Amedê, bû. Wî xwîna kurdan fir dikir.

Kolorîya Diyarberê rabû li peyî Yado ket. Dewleta tirk dest bi propagandeyeke wihî kir ku Yado dê Kurdistanê bide Ermenîyan û ew dixwaze Ermenîstaneke çêbike. Belê wekî îro ku dewlet ji PKK'ê re jî dibêje ermenî. Polîtîka dewleta tirk a ku bi derew û buhtanan li ser nijadperestîya Îslamî pêk hatiyê, gelek kevn e. Ev ta jî dema M. Kemal ve heta niha her berdewam e.

Yado, li çiyayên Kurdistanê geriya û piştê hat mal jin xwe girt û dîsa derket çiya. Esker û cahşên wê demê bi hev û du re ketin peyî wan. Ew bi jina xwe ve heft-heşt kes bûn. Jina wî tenê hêjayî çend mêran bû. Jineke çeleng û leheng bû. Eskerên tirk bi cahşên kurd ên wê demê re, derdor li wan girtin. Şer geş û dijwar bû. Di dawiyê de ji derî hevalekî wan, hemû li ser tîfingên xwe hatin şehîd kirin. Her wiha Yado û hevalên xwe ji ketin nav karwanên şehîdên Kurdistanê. Wey malik li ceş û sîxurên xerab be, herê wele-bîleh. Ceş û ceşetî di nav kurdan de kevn e. Wiha kevn û ku îro bav û kalên wan bûne kerê pîr û wan jî nav gühêrtine û bûne koruciyê gundan.

General Helmuth von Moltke: Leşkerên osmanî ser û guhên kurdan pêşkesî fermandarê xwe dikirin

DR. KEMAL SÎDO-KURDAXÎ

Sal 1838 Helmuth von Moltke li Kurdistanê

Her ku rojnamevanên biyanî behsa trajediya kurdan dikin, ew gotinên generalê Feldmareşalê Prûsî (almanî) Helmuth von Moltke tînin bîra xwendevanên xwe, wî digot: "Eger kurd bûbûna yek, dê tu kesî zora wan nebira!"

Moltke hatibû Kurdistanê ku alîkariya dewleta Osmanî di bihêzkirina serdariya wê de bike. Her wisa, yekser an ne yekser, beşdarî qirkirin û kuştina gelê kurd bûbû. Lê ji ber ku ew ne tenê leşkerê bû, efserê bû jî, ku rêz û hurmeta efseriyê digirt, wî gelek tiştên ku dikirin û didîtin di nameyên xwe de bi belge dikirin û ji dîrokê re hiştin. Her nameyêke wî belgeyê e ji belgeyên qirkirin û kuştaran (qetlîam) tirkan li Kurdistanê.

Ger mirovek yan miletek ji dîroka xwe fêr nebe, dê herdem xeletiyên dubare bike. Divê em jî ji dîroka xwe fêr bibin.

Divê ku li H. von Moltke, wekî rojhilat-nasekî jî bê nêrîn. Wî pir caran behsa kurdan kiriye. Dibe ku yekemîn car di çapemeniya alman de bi firehî Moltke li ser kurdan nivîsîbe. Wî di sala 1841'an di rojnameya almanî "Augsburger Allgemeine Zeitung" de gotareke fireh di bin navê "Welat û gelê kurdan" de nivîsiye.

tirkan de dida xuyakirin ku dewlet û artêşa osmanî di krîzeke kûr de ne. Ji ber vê yekê desthilatdarên osmanî berê xwe dan welatên rojava ji bo alîkariyê û reformkirina saziyên dewletê.

Hema di wê demê de dewleta osmanî careke din berê xwe da Kurdistanê. Çimkî Kurdistan nêzîktirîn herêm bû ji tirkan re. Bêyî xurtkirina serdariya xwe li Kurdistanê, tirkan nedikaribûn planên xwe yên aborî û leşkerî bi cih bînin. Ev yek bûbû sedem ku dewleta Osmanî bi hemû hêza xwe here ser welatê kurdan.

Di bihêzkirin û nûjenkirina artêşa osmanî de para gelek ewrûpiyan hebû. Ji ber ku nakokiyên osmaniyan bi rûs, îngilîz û fransiyan re hebûn, baweriya tirkan bi wan dewletan tunebû. Rûsya dijmînê sereke yê dewleta Osmanî bû. Otrîş (Awustriya) bi xwe car caran bi tirkan re li herêmên Balkanê şer dikir. Îngilistanê çavê xwe berdabû Misir û herêmên ereban yên ku li ser rîya Îngilistanê bûn.

Berjewendiyên Fransa jî, li ba Mihemed Elî Misirê bûn. Mihemed Elî Misirê wextê ku bi dewleta osmanî re di şer de. bû û gelek serok eşîrên kurdan ji piştgiyariya wî dikirin. Yek ji wan serokeşîrê kurd Tîmewê Beg bû, yê ku di 1831'ê de bajarê Mêrdînê kiribû bin destê xwe û rê li pêşiya leşkerên

tirkan biribû. Ji bilî vê, hinek çavkanî didin xuyakirin, ku di navbera Mîr Mehmûdê Rewandûzî û Mihemed Elî de pêwendî hebûne. Armanca mîrê kurd ew bû ku başûr, bakur û rojhilatê Kurdistanê bike bin destê xwe û dewleteke kurdî ya navendî ava bike.

Di rewşeke wisa de sultan Mehmûd II. ji xwe re li dostan digeriya.

Dewleta Osmanî li hevalbendan digere

Ji ber vê yekê tenê Prûsî di meydane de mabûn. Her çiqas dîrokzanê almanî Helmût Arndt dinivîse, ku tu berjewendiyên Prûsiya di Împeratoriya Osmanî de tunebûn jî, lê belê Prûsiya jî dixwest hêdî hêdî derkeve qada navneteweyî û para xwe di nav "Pirsa Rojhilat" de bistîne. Alîkariya osmaniyan fersendeke zêrîn bû ku prûsî vê yekê bi cih bînin.

Wekî min li jor gotibû, Sultan Mehmûdê II. bi çalakî li hin efseran digerî ku alîkariya tirkan di reformkirina artêşa osmanî de bikin. Di wê demê de rêxistinî û disîplîna leşkeriya prûsî li Ewrûpayê bi nav û deng bû. Generalekî fransî, wek H. Arndt behs dike, pirtûkek li ser vê yekê nivîsibû û bi kurtî gihîştibû vê bîr û baw-

eriyê: d'avoir un force militaire avec les moins de dépenses possible. Yanê bi pereyên hindik avakirin û xwedîkirina artêşeke xurt. Balyozê osmanî yê li Parisê Reşîd Paşa, ev nivîsara fransî wergerandibû tirkî û ji Sultan Mehmûd re pêşkêş kiribû. Wekî ku behs dikin sultanê osmanî rêxistinî û disîplîna leşkeriya prûsî gelek ecibandibû.

Gelo Moltke bi serê xwe çû alîkariya Osmaniyan

Moltke di 23.11.1835'an de gihîştibû Konstantinopolê. Dema ku Moltke gihîştibû Konstantinopolê, ew ji aliyê balyozê prûsî Graf von Königsmark ve bi wezîrê herbê yê osmanî serleşker Hûsrew Paşa hatibû nasandin. Ev dîdar (hevdiştin) bû sedema vê yekê ku osmanî ji şahê prûsî Friedrich Wilhelm III. daxwaz bikin da ku ew maweya mandina efserê xwe li dewleta osmanî dirêjtir bike. Ev daxwaza tirkan yekser bi cih hat û mandina Moltke ji bo sê mehane hatibû dirêjkirin.

Ez vê yekê li vir dibêjim, ji ber ku hin caran di çapemeniya alman de tê gotin, ku Moltke ne ji aliyê hikûmetê ve hatibû şandin, lê bi serê xwe çûye Tirkîyeyê û



Helmuth von Moltke kî ye?

H. von Moltke di 26.10.1800'î de li Parchimê ji dayik bûye. Ji sala 1819'an ve di artêşa Danîmarkî de efser bûye. Piştê Danîmarkayê bi cih dihêle û sala 1822'yan di artêşa Prûsî de dîsa wekî efser jiyana xwe ya leşkerî didomîne. Dema ku dewleta Osmanî ji Prûsiya alîkariyê dixwaze, ji bo tîkûzkirina artêşê, Serleşkeriya Prûsî biryar dide ku Helmuth von Moltke ji bo vî karî bê şandin. Di salên 1835-1839 de H. von Moltke wekî şervan û şewirmendekî diçe Konstantinopolê (Stenbol). Xizmeta H. von Moltke ji Împeratoriya Osmanî re dibe sedemê ji sedemên bi navûdengbûna wî li Almaniyayê. Di salên 1857-1888 de H. von Moltke dibe serokê stûnên leşkerî yên Prusiyayê. Helmuth von Moltke ne tenê bi karê leşkerî ve mijûl dibe. Ew her wiha di warê siyasetê de jî dixebite. Di 1867'an ew dibe nûnerê Partiya Parêzger di parlamentoya Almaniyayê de. Di sala 1872'an de dibe endamê herdemî yê xaniyê jorîn (Meclîsa Bilind) yê parlamentoya Prûsî. H. von Moltke beşdarî gelek şeran bûye. Li 1864'an de, di şerê Alman-Danîmarkî de yekemîn car di birêveberiya şer de beşdar dibe. Di salên 1866, 1870-71'an de serleşkeriya almanan di şerên bi Fransayê re dike. Piştî jiyaneke dirêj û tîj ji bûyer û serpêhatiyên, roja 24.04.1891'ê de li Berlînê Helmuth von Moltke diçe ser dilovaniya Xwedê. Tiştê herî balkêş di stratejiya leşkeriya H. von Moltke de ew e ku pêwîst e mirov şerê dijmînê xwe di nav-erdê wî de bike û lê bide.



Almanyayê hatiye çêkirin.

Kurdistanê û alîkariya tirkan kiriye.

Dewleta Osmanî alîkarî dixwaze

Di destpêka 1836'an de, Sultan Mehmed II. rîcayeye nivîskî ya din şand şahê Prûsyayê û tê de tika kir ku maweya mandina efserên alman li dewleta Osmanî bête dirêj kirin. Sultanê osmanî xwest ku 11 efser (subay) û 4 binefser ji bo alîkariya tirkan bîn şandin. Prûsiyan nedixwest ku rûsan tore bikin, lewre jî dane zanîn ku di şûna îngilîz û fransiyên prûsî li Konstantinopolê bin wê baştir be, hikûmeta Prûsya biryara şandina efseran ji



■ Moltke yekemîn car dibe şahidê şerekî di navbera leşkerên tirk û Îbrahim Paşa de. Wekî ku Moltke bi xwe dinivîse, rewşa artêşa tirk gelekî xerab bû. Piraniya leşkeran kurd bûn û ew bi zorê anîbûn leşkeriyê. Hinek ji wan kurdan bi zincîran hatibûn girêdan da ku nerevin. Gelek caran, dema ku fersend çêdibû leşker ji qada şer direviyan.

■ Tirk vê kelê di 13 gulanê de ji binî ve hildiweşînin û bi hovîtiyeke bêminak kurdên ku li wir dimînin dikujin. Sê rojan û sê şevan agir bi kelayê dikeve. Di nameyên xwe de Moltke diyar dike ku çawa ser, dest, ling û guhên kurdên kuştî ji aliyê leşkerên tirk ve tên jêkirin û tirk bi serbilindî van perçeyên laşên kurdan pêşkeşî fermanदारên xwe dikin.

bo dewleta Osmanî da. Dema ku hikûmeta Awistûrya bihist ku Prûsiya dixwaze efserên xwe bişîne dewleta Osmanî, ji vê yekê gelekî bi hêrs bû. Piştî dan û standineke dûr û dirêj Prûsiya biyara şandina tenê 3 efseran da. Û wisa di 5.7.1837'an de fermana birêketina her sê efseran têk çû û 14 rojan şûn de efserên alman von Vinke, Fischer û Mühlbach gihîştin Konstantinopolê.

Hikûmeta Prûsî ji efserên xwe xwestibû ku berî her tiştî di raportên xwe binivîsin û bişînin Berlînê. Ev yek dide diyarkirin ku hikûmeta Berlînê bi her tiştê ku li dewleta Osmanî diqewime, dizanibû.

Ji aliyê madî ve efserên Prûsî baş hatibûn sigortekirin. Ji bo çûn û hatina wan, her yekî nêzikî 3200 markên zêrî ji dewleta osmanî wergirtibûn. Ji bilî wê van serê her mehê 200 ji pereyên osmanî yên wê demê distandin. Ji bilî xizmetkirinên rojane. Efserên alman her wiha parinca (meaş) xwe ya mehane li Berlînê jî distandin. Wekî ku H. Arndt behs dike, piştî ku H. von Moltke vegeyabû Berlînê, wê nêzikî 10000 taler (pereyên zîvî yên almanî) ji xwe re gihandibûn hev û bi wan pereyan hin parnema (sehim) yên trêne kiribûn.

H. von Moltke piştî ku li Konstantinopolê peya bû, çû seredana Asyaya Biçûk, beşa ewrûpî ya dewleta Osmanî, herêmên navbera Donau û Deryaya Reş Rumeliyê, Bulgariya û Dobrudca. Li adara 1838 Moltke dibe şewirmendê fermanदारê leşkerê Torosê Hafîz Paşa û diçe Kurdistanê. Her wisa ew beşdarî serkutkirina raperîna kurdan dibe. Ew di şerê di navbera tirkan û leşkerê misrî yê di bin fermandariya Îbrahim Paşa zartîmarê Mehmed Eliyê Misirê, de jî beşdar dibe. Moltke di wê demê de gelek nexşeyên (harta) cografîk yên herêmê ji çêdike. Dema ku Moltke tevî leşkerên tirkan di şerê Nisibê de ji ber Îbrahim Paşa direvin, hin ji van nexşeyan winda dibin.

Di seriya 1838'an de şer dest pê dike. Hafîz Paşa fermanê dide Moltke û Mühlbach ku lêkolîneke leşkerî li ser meydana şer çêbikin. Armanca tirkan ew bû ku rê nedin Îbrahim Paşa û hevalbendên wî yên kurd çiyayên Torosê derbas bikin

û nêzikî li Konstantinopolê bikin. Moltke di Samsûn û Sêwazê re derbasî Meletê dibe. Li 28 adarê 1838'an piştî 65 saet siwarî, ew digihîje Dîlokê. Ji wir Moltke di Behesen û Adiyamanê re (Semsûr) heta ser çemê Ferat diçe. Moltke lêkolîne li ser Çemê Ferat bi başûrê rojava ve heta Bîrecikê dike. Li 8'ê avrêlê ew digihîje Çemê Dîclê, Amedê. Di wê demê de baregeha şerekî ya leşkerî turusê li Amedê bû. Moltke bi darbeşanekê, ku ji eyarên mî û bizanan hatibû çêkirin, di çemê Dîclê re ji Amedê heta Mûsilê diçe. Ev çûna wan sê roj û nîvan dirêj dike.

Ji bo ku berxwedana kurdan bête şikandin, Hafîz Paşa sê hezar û pêncêd leşker top dike û êriş dibe ser Seîd Begê, kelaha kurdan li ser pozê çiyayekî bû. Piştî çend rojan leşkerên tirkan bi alîkariya Moltke kelaha kurdan di 9'ê gulana 1838'an de digirin û Seîd Paşa jî esîr dikeve destê tirkan. Tirk vê kelê di 13 gulanê de ji binî ve hildiweşînin û bi hovîtiyeke bêminak kurdên ku li wir dimînin dikujin. Sê rojan û sê şevan agir bi kelayê dikeve. Di nameyên xwe de Moltke diyar dike ku çawa ser, dest, ling û guhên kurdên kuştî ji aliyê leşkerên tirk ve tên jêkirin û tirk bi serbilindî van perçeyên laşên kurdan pêşkeşî fermanदारên xwe dikin.

Kurdên ceşş alîkariya tirkan dikirin

Her çiqas tirk bi hovîtiyê diçin ser kurdan, şervanên kurdan serê xwe ji torinên mongol û tataran re natewînin û bi lehengî li berxwe didin. Di wê demê de jî, wekî îro kurdên ceşş alîkariya tirkan dikirin. Axayekî kurd bi navê Mehmed Beg tevî peyayên xwe beşdarî vê kuştara (qetlîam) kurdan dibe.

Li 4 Hezîrana 1838'an tirk waregeha xwe ya şerekî diguhêrin û li Xerpûtê bi cih dibin. Hema di wê demê de nûçeyek bi tirs digihîje waregeha şerekî ya tirkan. Hafîz Paşa dibihîze wekî Îbrahim Paşa leşkerên xwe li nêzikî Helebê topî ser hev dike. Fermanदारê tirk fermana meşa ordiya torosê dide û dixwaze, ku ji nişke ve li Îbrahim Paşa bide û ji bo vê yekê, ew Feret derbas dike.

Leşkerên kurd bi zincîran hatibûn girêdan

Li dawiya dawî Moltke yekemîn car dibe şahidê şerekî di navbera leşkerên tirk û Îbrahim Paşa de. Wekî ku Moltke bi xwe dinivîse, rewşa artêşa tirk gelekî xerab bû. Piraniya leşkeran kurd bûn û ew bi zorê anîbûn leşkeriyê. Hinek ji wan kurdan bi zincîran hatibûn girêdan da ku nerevin. Gelek caran, dema ku fersend çêdibû

leşker ji qada şer direviyan.

Moltke di nameyên xwe de dide zanîn ku heke Hafîz Paşa guh bida şîretên wî de tirk di şerê Nisibê (Nizîp) de neşikestana. Moltke pêşniyaz kiribû ku tirk bi şûn ve vegevin. Li gorî dîtinê min, mirov divê li ser vê yekê baş lêkolîne bike. Lê dîsa jî ez dikarim bibêjim ku, qedera leşkeriya tirkan xuya bû; dê ew di wî şerî de her bişikestana. Ji ber ku rewşa artêşa wan, wekî Moltke bi xwe dinivîse, gelekî xerab bû.

Artêşa tirk li Nisibênê têk çû


Nûçeya têkçûna artêşa tirkan li Nisibê (Nizîp), di pûşpera 1839'an de negihîşt Mehmed II. Berî ku ev nûçe bigihîje Konstantinopolê sultanê osmanî mirîbû. Li şûna Mehmed II. Sultan Abdülmecîdê şanzdeh salî hat ser textê padişahiya osmanî. Mihemed Alî yê Misirê, Sûriyeyê û perçeyek ji Kurdistanê xistibû bin destê xwe û riyên paytexta osmanî li pêşiya Mihemed Alî mabûn vekirî. Îngilîzan nedixwestin ku Misir mezin û xurt bibe û her wiha karibe riyên Hindistanê têxe bin destên xwe. Her wiha London ditirsiya ku Konstantinopol bi carekê ve tekeve bin bandora Rûsyayê.

Lewre jî hêzên avî yên îngilîzî êriş birin ser artêşa misirî li Bêrût, Akkon û Aleksandiriyê. Loma misrî mecbûr man ku daxwaza aştîyê bikin. Her wiha di gulana 1841'an de li Londonê peymaneke navneteweyî hate îmzekirin. Li gorî vê peymanê pêwîst bû ku Mihemed Elî xwe ji Sûriyeyê û Kurdistanê vekîşîne.

Piştî têkçûna tirkan li Nisibê, padişahê Prûsiyan Friedrich Wilhelm III. fermana vegeva efserên prûsî ji dewleta osmanî da. Li ser rîya vegeve di dawiya payiza 1839'an de Moltke bi dijarî nexweş ket û ew li Budapeşte gelekî ji hevketibû û bi zehmetî xwe gihandibû Vîyanayê. Moltke roja 27.12.1839'an gihîştibû Berlînê. Padişahê prûsiyan di koça xwe de pêşwazî li Moltke kir û xelata "Pour le mérite" pêşkêşî wî kir.

Wekî ku dirokzanê almanî H. Arndt dinivîse, Moltke vegeyira Berlînê, ber maseya nivîsandinê û bawernameyek di destê wî de bû, ya ku ji aliyê Hafîz Paşa ve hatibû amadekirin. Ew bawername şahidê destpêka hevalbendiya almanî-osmaniyan bû. Di wê de wiha hatibû nivîsandin: Ew di şerê Nisibê de ji destpêkê heta dawiyê bi dilsozî bi erkên xwe rabûye û wî efserî bi mêrxasî, lehengî û fedakarî xizmeta hikûmeta osmanî kiriye.

Pirsa Jînê



Her miletê ku dixwaze bijî, divê li ber xwe bide û xwînê birjîne. Berê ji hate gotin: **"Tiştê bi zorê diçe, nayê vegerandin ji bilî zorê."**

Lê yê ku ev raman xweş da xuyakirin û jîn kuta kir di pirsekê de ew şehîdê nemir "Mazlûn Doğan" e, yê ku di rûyê dagirkeran de kire qîrin û got:

"Berxwedan Jiyan e"



Jîn, jin, jiyana di hela bilêvkirinê de ev her sê pirs nêzikî hev û du ne. Lê di wateyên xwe de, jîn; bi zimanê erebî "heyat" e û bi zimanê inglîzî "life" e û ew bi xwe jî dema ku mirov tê de dijî ji bûyinê ta mirinê ye. Jin, ew pîreke an "kadûn" û "eksik" e bi zimanê tirkî. Gelo ka çi têkilî di navbera jîn û jinê de heye?

Di mîtolojiya mîletan de jîn, nişana jinê ye û mîletên kevnan tev de li jinê dinêrin jêderka jinê ye.

Jiyan; perçeyek ji jinê ye an jîneke taybet e, xuyaye ku wateya pirs jîn fi-rehtir û gelemperî e jî pirs jiyana

Ev nêrineke ferhengîye, lê ka di torê û wêjê de jîn çiyê ?

Jîn di torê de

Jîn ev derya bê binî, ev pirsê bê bersiv, ev aloziya bê çare, ev dehla bê serî û binî, ev raza mezin e ku kes negihîşt-te dawiyê, ev warê ku candar e ku mirov lê dibine mêvan bê ku zanibin rastiya vî warî çi bû...!

Jîn ev kula di hundirê min de dîkele û ez dixwazim bigihîme encama wê, lê nikarim, her ku ber bi wê diçim, ew dîr dikeve wekî pêpîrk û rewrewkê geh dixwîne û geh ji ber çavê min wînda dibê. Karker kar dikin, bijîşk nexweşan derman dikin, oldar gazîya yezdan dikin, evîndar sozan bi hev re didin, şoreşger şoreşê germ dikin û hwd.

Lê ev tev wêneyekî çêdikin û di tabloyekê de dicivin. Ew tablo bi navê jînê ye.

Jîn û Cîgerxwîn

Gelek helbestvan, torevan, feylesof nêrinên xwe li ser jînê danîne. yek ji wan helbestvanê kurd yê bi navê deng Cîgerxwîn e. Ew di helbesteke xwe de li ser jînê kûr diramê, lê nagihêje tu encamê û dibêje:

*Ne Cizîrî, ne Xanî
Kesî bersiv nezani
Sed wek Feqiyê Teyran
Dî vir de mane heyran
Pir dijwar e ez benî
Ne serî û ne binî*

Lê xuya ye ku Cîgerxwîn tiştêk jî rastiye neda dest me, hîn rê li pêş me wînda kir û ew bi vê nêrîna xwe nêzikî felsefeyê hebûnê dibê, ya John Paul Satre ev felsefa dibîne ku mirov ne ji tiştêkî tê û dihere netiştêkî û ta Cîgerxwîn bêhtir eşkere bike ku ew bawer-mend e bi vê felsefeyê dibêje:

*Ev jîn herdem hebûne
Ne ji Adem çêbûne
Jîndar hene her û her
Çi ên hişk û çi ên ter*

Lê Cîgerxwîn daxwaza xwe di tebayên avî de dîtiye, ji ber ku dibîne ku ew

jîneke pir xweş dijîn, ji ber ku dibîne ew jîneke pir xweş dijîn jîneke bê destûr, bê mele, bê keşe, di vî warî de berê xwe dide ava çêm û dibêje:

*Ew qas teba gir û hûr
Dijîn tê de bê destûr
Ne mele û ne keşe
Ev jîn bi wan çî xweş e*

Beriya ku ez babeta jîn li ba Cîgerxwîn kuta bikim, ez divê bidim zanîn ku ev dahûrandina min li ser helbestekê jî helbestên wî bû, ya bi sernavê "Sermetê Evîm im" di diwana wî ya şeşan de bû û heger mirov bixwaze, jînê di hemû helbestên Cîgerxwîn de dahûrîne, wê gelek rûpel jê re biven.

Jîn û kurd

Ev jîn bi hêsanî derbas nabe. Ji ber ku berê hatê gotin: "Ta mirov pariyê xwe necû, nikare daqurtîne" û ev tişt ne bes di jiyana kesane de pêk tê, lewre jiyana mîletan jî wîha ye û ji ber vê, helbestvanê hêja Tîrêj berê xwe dide gelê kurd û dibêje:

*"Wek Tirêj dibêje
Jîn divê kotek û zor e"*

Xuya ye ku destûra jînê ev e "Hêr mîletê ku dixwaze bijî, divê li ber xwe bide û xwînê birjîne" û gelê kurd îro ev jê re divê ta ku bigihêje maf û arman-

cên xwe. Berê ji hate gotin :

"Tiştê bi zorê diçe, nayê vegerandin ji bilî zorê." Lê yê ku ev raman xweş da xuyakirin û jîn kuta kir di pirsekê de ew şehîdê nemir "Mazlûn Doğan" e, yê ku di rûyê dagirkeran de kire qîrin û got:

"Berxwedan Jiyan e"

Divê ev her du hevok bi zêr werine nivîsandin li ser rûpelên ji rewşên.

Helbestvanekî kurd jîna mîletê me dide hember jîna mîletên din ên li cîhanê û dibîne ku ev mîlet bi xweşî û şadî dijîn, lê tenê kurd jar û perîşan in gelo ma ta kengî eme jar û perîşan bin....?!

Ev helbestvan dimêje

Jîna mîletan li xakê cîhan caw û cil

Di nav baxê gula dest wan çiçek û

sorgul in

Kurdên me tenê jar û perîşan û kul in

Ta em kurd jîneke baş û çak ji xwe re çêkin, ji me re divê xwendin û zanîn û avdana dara jiyane bi xwînê, ji ber ku berê hate gotin: "Dara ku tu bi xwîna xwe av nedî fêkiyên şêrî nagire."

Di vî warî de helbestvanê hêja Tîrêj dibêje:

*Dara jiyane şîn e
Ava ku tê ser xwîn e
Her xwendin û zanin e
Ne ku sêv û hirmî ne.*

Bêzar Kobanî



Li navenda çandê çalakiyên vê hefteyê.

Li NÇM'ya Stenbolê

● 06.09.1997 **În:** Ji Beşa Sînemayê ya NÇM'ê filmê Heval, derh:

Y.Güney, saet:18.00

● 07.09.1997 **Şemf:** Konsera Koma Amed, saet:14.30

Ji Şanoya Hêvî listika "Gurî", saet:18.00

● 10.09.1997 **Çarşem:** Îmzekirina Pirtûka "Mêrê Avis" Helîm Yûsiv, saet:16.00: Semîner "Astengên Çanda Kurdî"

Nivîskar Helîm Yûsiv, Helbestvan Jan Dost, saet:18.00

● 12.09.1997 **În:** Ji Beşa Sînemayê ya NÇM'ê belgefilmê "Aynalar"

(Yılmaz Güney)

Derhêner: Can Dündar

NÇM'ya İzmir:

● 06.09.1997 **Şemf:** Konferansa Cemşîd Bender: "Mîtolojiya kurdan", saet:17.00

● 07.09.1997 **Yekşem:** Bîranîn, saet:14.30

Konsera Hozan Cezmî, saet:18.30Li Beksavê

● 06.09.1997 **Şemf:** Filmê "Kerî", derhêner: Y.Güney, saet:17.30

● 07.09.1997 **Yekşem:** Belgefilmê Y.Güney, derhêner: A. Soner, saet:14.00

AWIR

Leydî Dî 'Ana' mir

Li Tirkiyeyê jî gelek kes li ser Leydî Dîanayê giriyan, lê em bawer in rayedarên tirk li pişt deriyan dan lotikan, lewre raya giştî ya cîhanê çalakiya aştîyê jî bîr kir.

Îdeologên sîstema kapîtalîst ku he-nekên xwe bi gelê Koreya Bakur di-kirin, ji ber ku li ser rêberê xwe Kîm Îl Sung digirin, gelo wê li ser rewşa ge-lê Îngilistanê ya piştî mirina Leydî Dî-anayê çi şîrovevê bikin?

Mirov dikare helwesta gelê Koreyê fêhm bike, ji ber ku Kîm Îl Sung ji vî ge-lê re pêşengî kiriye, lê gelo Dîanayê jî Îngilîzan re çi kiriye, çi xêra wê, gihîş-tiye gel? Wisa xuya ye ku kapîta-lîzm mirovan dike qirdik, bi riya medyayê pê di-lîze.

Li aliyekî sîs-tema kapîtalîst li ser berje-wendiyên pe-re qezencki-rînê hatiye danîn, hemû hêjahî daxîs-tîne bazarê, çi tiştê ku jê re kiryar derkevin, divê bê firotin. Ji ber vê yekê jî pira-niya rojnamergeran dest avêtine paparazîtiyê, li hêla din jî, ji ber ku di qezaya Leydî Dîana de, destkariya paparazîyan hebûye, wan sûcdar dikin.

Niha gelek tişt bi ber lehiya hêstirên ku ji bo Leydî Dîana hatin rijandin, ketin. Hinek kesan ji dil û hinavên xwe hêstir rijandin, hinekan jî hêstirên tîm-sahan rijandin. Hinek kes ji dil bi ber Dîanayê ketin, hinekan jî li pişt deriyan dan lodikan, lewre gelek arîşe û alozi-yên xwe jî avêtin nava vê lehiyê û ji bo demekê bi gel dane jibîrkirin.

Dîana ji bo dewleta tirk bû Dî Ana. Belê li Tirkiyeyê jî gelek kes li ser Leydî Dîanayê giriyan, lê em bawer in rayedarên tirk li pişt deriyan dan loti-kan, lewre raya giştî ya cîhanê çalakiya aştîyê jî bîr kir. Belkî ji ber vê yekê be-

rî her kesî kesî Serokomarê Tirkiyeyê Demirel nameyek serxweşiyê jî malba-ta qraltiyê ya Îngilîz re şand. Çapeme-niya tirk ku ji serdanpê bi nûçeyên ma-gazînî dagirtiye, wekî nêçîrvanê ku xwe biavêje ser çêlkewan, xwe avêtin ser vê nûçeyê. Rojnameriyên tirk rûpe-lên xwe bi vê bûyera 'dilsotîner' xemilandin. Wê jî tere nekir nivîskarên qun-cikan jî dest avêtin mijarê. Bo nimûne Gerînendeyê Giştî yê Sabahê Göngür Mengî, dibêje:


"Leydî namire!", di sa di rûpelên din de Leydî Dîana we-kî qehremana sedsala bîstan hatiye binav-kirin.

Di Radî-kalê de Is-met Berkan dide xuyaki-rin ku Serka-niya Giştî ew bêagahî hiştine, lewre wan ji bêgavî dest bi çapkirina jiyana Leydî Dîanayê kirine. Ya-nê bi awayê ku pêşiyên me gotine: Goştê berxikê bi dest wan neketiye, lewre wan ji mecbûrî berê xwe dane goştê mirîşkê.

Rayedarên tirk li aliyekî diplomat û welatiyên Îngilîstanê bi polisên xwe didin kutandin, li aliyê din li ser leydi-ya wan digirin. Belkî hinek kes bibêjin, kêfa wan ji kesên ji rêzê re nayê, bi te-nê ew hez ji kesên aristokrat dikin. Lê ew jî ne rast e, lewre em dizanin ku dewleta tirk ev çend sal in ku deriyê xwe ji Lord Avebury re girtiye, ji ber ku ew piştgiriya gelê kurd dike. Yanê mirov dikare dibêje, di vî warî de jî ra-yedarên tirk ne ji dil in. Lewre ew li derve rondikan dibarînin, li pişt deriyê qesr û qonaxan jî ji kêfan didin lotikan.

TÎŞK

BEKIR BAHOZ



Diway Hêrişî Supay turk bo ser Başûr

Turkiye le mêj bû le bîrî ewe da bû zebrekî tund le bizûtinewey rizgarîxwazî neteweyî Kurdistan bida. Seranî rijem ku le rastî da gemey destî generalekan in, hemîşe bîr le ewe dekenewe ke kêşekanî nawxoy welat berme derê û weha nîşa biden ke hoy hemû kêşekanî nawxoy welat, bezandîni sinûrî Turkiye ye le layên gerîla we. Supa her le seretay em sal ewe destî kird be leşkêrkêşî bo ser sinûrî başûrî Kurdistan. Be deyan hezar serbaz û çaş û be sedan tank û zerîpoş peywendikanî xoy legel PDK, PDK'ş amade bû şan be şanî supay turk pelamarî cengaweranî Partî Kirêkaranî Kurdistan, PKK bidat. Çunke le rastî da, PKK tenya dij be dewletî Turkiye şer nakat, belkû le heman kat da le pênanawî yekêti neteweyî û derhênanî reg û rîşey napakî û helweşandîni sîstemî derebegayefî û eşîriyayefî da tedekeşe. PDK'ş lew riwangeyewe hest be metirsi tiwanawe û le nawçûn dekat, her boye bê sê dû amade bû hawkarî supay Turkiye bikat.

Supay Turkiye diway gewretîrî amedekarî le dîrokî xoy da rojî 14'î gulan hêrişî berfiriwanî xoy bo ser başûrî Kurdistan dest pê kird. Turkiye peyta peyt şanazî be ewe dekird ke ew le ser daxwazî layenêkî "Bakûrî Iraq" (PDK) leşkêrkêşî bo ser Başûr kirdiwe. Her weha Turkiye lew bawere da bû ke le maweyekî zor. kurt da, hêze çekdarekanî PKK le naw debat û meydanî bo text debê nexşe û planekanî xoy pêk bîne. Her le seretay hêrişekewe kardaneweş layene şoreşgêrekan û cemawerî niştîmanperwerî xwarûy Kurdistan dewletî turk û hawpemanekanî ewî sersam kird. Helwêstî camewer û layenekanî Başûr bo Turkiye çaweriwan nekraw bû, sareray ewey cewamer her le rojî yekemî hêrişekewe narezayî tundîyan nîşan da, hendê le partekanî Başûrî Kurdistan be taybetî Hizbî Sosyalîstî Demokratî Kurdistan (HSDK), be kirdewe pêy naye mey-danî bergirî.

HSDK her le seretawea hestî be metirsi dagîkirdîni başûrî Kurdistan kird, qewarey planeke hênde gewre bû ke nedekra layenêk be tenya berengarî bêtewe. Sekretêrî HSDK kak Hemey Hacî Mehmûd le çend dîdarêkî rojnamergerî û televîzyon de le welamî pirsîyarî sebare be hawkarî û morkirdîni protokoli karî hawbeş legel PKK, heman welamî heye, welamekeşî le şewey pirsîyar da ye, ew delê: "Boçî rewa ye dujminanî kurd yek bigirin û pelamarî Kurdistan biden? Boçî rewa ye hêzêkî koneperist û dujmin be amancekanî gelî kurd yek bigirin û pelamarî balî rizgarîxwazî neteweyî biden û hewl biden le nawî berîn?! Ey boçî rewa niye dû layenî şoreşgêr û pêşkewtuxwazî wekû PKK û HSDK neçine heman sengerî bergirî kirdinewe?"

Xoragîrî û bergirî qaremaneney gerîlakanî ARGK û pêşmergekanî HSDK û cemawerî başûrî Kurdistan, hemû nexşe û planekanî Turkiye û PDK'î serûbin kird. Supay Turkiye diway ewey zebrekî tundî berkewt, be pele le xwarûy Kurdistan kişayewe. Nek neytiwanî PDK bipolarîzî, belkû bo xoşî mawey diyarî kirawî bo nebraye ser, wekû witman kişaye diwawe. Çawdêranî siyasî way bo deçin ke le naw hemû amancekanî Turkiye da, tenya yek amancîyan bedî hat, ewîş dest pêkirdîni şer nêwan dû layenî kurdî da wate PKK û PDK.

Bi giştî mirov detwanê bilê ke diwa hêrişî û pelamarî supay Turkiye bo ser başûrî Kurdistan, nek her hêzekanî PKK'y le naw nebîrd, belkû em car le hemû carê ziyatîr neteweyî kurdî le yek nîzik kirdewe, yan be şeweyekî tir detwanîni bilêyn ke hêrişî supay Turkiye bo ser xwarûy Kurdistan û hewlî sermekewtî bo dagîkirdîni, berey niştîmanperweran û ewaney bo rizgarî û şerbexoyî kurd û Kurdistan tedekeşin, le berey niştîmanfiroşan ewaney hawkarî dagîrkeranî Kurdistan deken ciya kirdewe. Êta helêkî zêrin le ara da ye bo pêkhênanî yekêti neteweyî û daristanî stratîjiyekî neteweyî hawbeş, eger êta kurd yer negirin û be yek dil û be yek giyanawe neçine sedey 21'mewe, edî çaweriwanî kengê deken?

Mizgîn

XURŞÎD MÎRZENÎ

Mizgîn di zimanê kurdî de navê keçikan e. Lê xalê Zendo Mehro navê kurê xwe Mizgîn danibû. Di yazdeh saliya Mizgîn de, cara ewil Mehro kurê xwe Mizgîn anî Amedê mala xwarziyê xwe, ba metika wî. Amed ji Mizgîn re gelek mezin hatibû û Mizgîn li hemberî mezinahiya Amedê heyîrî mabû.

Piştî du rojan, xalê Zendo Mehro lêda çû gund û Mizgîn li mala metika xwe ma.

Li gund dibistan tunebû û Mizgîn dibistan nexwendibû. Yanê heya yazdeh saliya Mizgîn, temamê cihana Mizgîn gundê wan, çol û çiyayên xuya û du sê gundên dorhêlê bûn. Mizgîn wekî bavê xwe nexwendî bû û tenê pez û dewar dinasîn. Mizgîn dizanibû hemû cihan wekî gundê wan e û cihan hemû bi kurdî diaxivîn û kurd in. Der heqê pez û dewaran de û çûn û hatina nava gundiyan de hinek tişt dizanibûn û ne zêde. Lê haya Mizgîn ji vê cihana gergedan nîn bû. Lixwekirina Mizgîn îşlikek marbelaş, şalwarekî dibêtê reş û lastîkek terebzan bûn. Mizgîn gubbel (zîrek) bû lê, hem di alî zanistî de û hem jî di aliyê aborî de, rewşa bavê Mizgîn ne baş bû, yanê bavê Mizgîn yekî bê-mecal bû. Carinan metika Mizgîn ji zarokên birayê xwe re hinek pel û potên kevn dişandin gund.

Bihar e, meha gulanê ye. Ser bedena Amedê tijî eraqvexwar û serxweş in.

Rojekî heyam xweş bû, Zendo Mizgîn girt û bi xwe re bir çarşiyê.

Heya gihan ber Deriyê Çiyê (Dağ Kapî), Mizgîn hezar tişt ji lawê metika xwe Zendo pirsin. Li Derê Çiyê heykelê Kemal bala Mizgîn zêde kişand û Mizgîn jî lawê meta xwe pirsî:

- Kekê Zendo ev çi ye?
- Heykel e.
- Heykel çi ye?
- Ji kevir mirov çêkirine.
- Çima ji kevir çêkirine?
- Tirk ji tiştê wiha hez dikin.
- Bi diravan (pereyan) çêkirine an yekî belaş çêkiriye?
- Bi diravan çêkirine, kî belaş çêdike.
- Bi çi qasî çêkirine?
- Ez baş nizanim lê bîst hezar heye.
- Errik! Çend heb bizin bi wan diravan tîn kirin?
- Hezar heb.
- Wele ez bizina me ye bej tenê jî nadim bi vî kevirê hanê.
- Çima çi bû?
- Ji çi re dibê? Kevirê di nava qoriya me ya Qula Hemzo de heye, em jê re dibêjin: "Kevirê duqul" çar qat ji vî kevirî xweşiktir e. Hezar panqenot bidin Husoyê Boldûzer wê ji wan re, ji wî bîst heban bineqirine. Wele kê ji wan re ev kevir niqirandiye, ew xapandine. Ew qas pere nake.



- Ez baş nizanim. Lê bêtî diravan kesek heykelekî wiha çênake.
- Ev tirk çawakî ne? Xuya ye ne jîr in?
- Hemû ziftî û beqçî ne.
- Yanê ziftî û beqçiyên ev heykel çêkirine?
- Na, na mezinên wan çêkirine.
- Xuya ye mezinên wan jî xêt in.
- Ez wan nas nakim
- Ez jî nizanim. Ji me bi xwe re tu feydeke wî nîn e.
- Li vir çi dike?
- Beredayî...
- Çima anîne li vir danîne?
- Forsa xwe nîşanê me kurdan didin.
- Forsa çi?
- Fors fors, forsa çi? Tu nizanî fors çi ye?
- Ez dizanim. Eslê van ji ku ne?
- Mihacirên ji hêla Mongulyan in.
- Yanê ev jî pismamên Xeloyê Mihacir in?
- Xelo kî ye?
- Xelo ji Şimşimê ye û wênêkêş e. Li gundan digere û wêneyan dikişîne. Gundî dibêjin sîxur e. Kerselekî temam e. Di her rûniştinekê de tenûrek nan dixwe. Kî wî bike mîvan mala wan kambax dibê, tu caran tîr nexwariye, mirov dibêje qey ji ber xelayê filitiyê. Kurmanciyeke wisa diaxive ku bizin jî bi kurmanciya wî dikenin. Mîna bergîrê deştiyan, yekî qûşfilitiyê tirek e. Navê jina wî Şerpeze ye. Xelo kerekî çolê ye. Pêncî sal in ku macirê Şimşimê bûne, lê niha jî kurmancî hîn nebûye. Ew jî wiha yekî rewtele ye, belkî bi qasê vî heykelî heye. Xelo jî dişibe vî heykelî. Mezinên wan li ku dimînin?
- Li hemû Anatoliya belav bûne.

- Ewên xalê te bi zorê birin leşkeriyê ew in.
- Kurdî hîn bûne yan ew jî weka Xelo ker in?
- Ew ji xelo xirabtir in, tirkê zir in.
- Mizgîn hinekî din jî li hêkelê Kemal nihêrî, jê re bê wate hat, neket serê wî û bi temamê wê zarokatiya xwe wiha got:
- Wele yekê baş xuya nake.
- Baş be jî, baş xuya neke jî bavê wan e. Tiştêkî me û wî di nava hev de nîn e. Li wan pîroz be.
- Niha ev Diyarbekir a me ye an a ziftî û beqçiyên e?
- A me ye, çima a wan e.
- Heke bajarê me ye; çi karê wan li vir heye?
- Bi zorê hatine û naçin.
- Qey ew bi me dikarin?
- Belê. Gelek kertolên me kurdan piştî wan digirin.
- Çima? Qey bînamûs in?
- Ne tenê bînamûs, bêhisyetin jî.
- Leşkerên wan li ku ne?
- Li vir, li aliyê Seyrantepe ye ne.
- Bajarên wan ên mezin wekî Amedê hene?
- Belê, hene.
- Bila bigirin vî kevirê hanê bibin li bajarên xwe deynin. Çima anîne li bajarê me danîne.
- Ji bona me bitirsîn.
- Çima qey kurd ji wan ditirsin? Ez bi xwe ne ji wan û ne jî ji bavê wan natirsim.
- Na na, em jî natirsin, lê...
- Piçek jî mezin bibim, ezê li wan xim û wan ji bajarê me biqewirînim.
- Mizgîn careke din jî di kêlekê de li heykelî nêrî û wiha got:

- Dişibe Tewfoye mala Emeran. Tewfo yekî mirûziyê qilêrî ye. Wekî gayê xayin li mirov dinihêre. Tenê ferqa wan, ev kevir e, Tewfo jî can e. Mîna jê hez nekir. Ez dibêjin qey bizina me ya ask wî biriye.
- Çima bizina we ya ask çi bû?
- Bizina me ya ask wînda bû. Heya niha jî em nizanin bê kê biriye. Lê ez dibêjim qey pêçiya vî heykelî di dizîya bizina me de heye.
- Bizina we ya ask kengê wînda bû ye?
- Bû pênc meh.
- Belkî guran xwariye.
- Na kekê, guran bixwara me ya hestiyên wê li çolê bidîta. Me hestiyên wê jî nedîtin.
- Yanê tu dibêjî pêçiya vî heykelî di dizîna bizina we de heye?
- Wele dişibe wan... Waye xuya ye hey mirovekî baş nîn e. Tu nabînî çi qas rûyê wî tîrêş e? Mirov dibêje qey yekê bê bav e, bavê xwe nas nake. Ev hê kevirê wî ye ku ewqas qilçix e, îcar kî çi zana bê birayên wî çawakî ne. Xwedê zana.
- Ez zen nakim ku pêçiya wî di birina bizina we de hebe.
- Çawa? Wele ne bizin, karik ji bî destê wî keve, bernade. Tu wan çavên wî nabînî? Wekî birçiyên li me dinêre. Hindik maye kevirê wî dev li me bike.
- Mizgîn xwe nasî û seh kir ku dewleta tirkan di destên eşqiyezan de ye. Keleşkofa bavê xwe avêt ser milê xwe û derket çiya. Li hemberî eşqiya û çeteyan şer kir. Di sala 1993'yan de li piştî Licê şehîd ket.
- Birayên Mizgîn li ber berkoleyên wî gul û aqasya çandine. Bila di nava nêrê de razê.

Berhevoka kaniyeke bi çoš

Her wekî Bakur, li Başûrê Biçûk jî qedexeya li ser zimanê kurdî hê ranebûye. Li wir helwesta dewletê li gorî demê diguhere, roj dibe dewlet dengê xwe dernaxe, roj tê kesên ku çend rêzên bi kurdî bi wan re tene girtin, bi mehan di zindanê de dimînin. Lewre jî kurdên vê beşa Kurdistanê berhemên xwe bi piranî li Lubnanê didin çapkirin.

Pirtûka Nezîr Palo ya bi navê "Qîrîn" Ne jî ji ber heman sedemê li Beyrûtê hatiye çapkirin nivîskar di pêşgotina pirtûkê de helbest wekî "kaniyeke bi çoš" û "pirseke mezin di jiyânê de" bi nav dike. Piştê re jî di de zanîn ku ew bi vê berhevokê "zanava xwe dibêje" da ku xwendevan "tê de şîn û evînê pelînin." Piraniya helbestên di pirtûkê de li ser evîna dil û welat in. Her wiha li ser jiyân û helbestê bi xwe jî ramanên felsefî bi zimanekî wêjeyî wekî helbest hatine rastin. Bo nimûne di helbesta bi navê "Feheng" de bi gotinên,

Di fehenga/ evînê de/ her gotinek/ çilpîkek xwîna mine

Di Fehenga/ janan de/ her tîpek/ keserek mine

Di fehenga/ jiyânê de/ ez ji bîr, bûme

digel rewşa xwe kambaxiya rewşa kurdan jî tîne zimên.

Belê, di fehenga jiyânê de kurd jî bîr bûne, hinekan xwestine ku wan bi temamî bidin jibîrkirin, hemû xebata gelê kurd jî ji bo vê yekê ye ku hebûna xwe bi bîra cihanê bixe.

Di helbesta bi navê "Girî" de nivîskar sedema helbestvaniya xwe dide zanîn. Wî li ser sîngê welat, dayik û yarê daye girîn, wan hersêyan helbestek şîn girêdayî rastine, ew helbest hê jî di dilê wî de digirî. Her wiha nivîskar hestên xwe yê li ser evînê rave dike:

Tenbûrvan.../ di tilîyên xwe re/ canê xwe/ berdide nav/ têlan

Dengbêj.../ li ser dengê xwe/ dilê xwe/ diyar dike Helbestvan.../ li ser rûpelan/ hişê xwe/ dirjîne...

Di dawiyê de dildariya xwe bi van gotinan radigihîne:

Can û dil û hişê min/ bûne çivîkek/ û di rekeha/ dilberê de/ dixwîne...

Helbestvan Nezîr Palo di helbesta "Lêgerîn" de piştî ku li gelek deran li evînê digere, dibêje: *Li dawiyê/ piştî ku ez bê hêz mam/ min zanî ku*

evîn.../ di sîtava bijangên/ welat de/ raketiye diyar bike. Bi van gotinan jî nişan dide ku kaniya evînê welat e.

Helbestvan dîrok û cografyaya kurdan di rûyekê kalemêrekî kurd de nîgar dike. *Di nav qurmîçkên/ eniyê de/ Dumdum û Laleş/ dîrok welatekî ji bîrkirî/ ava dîkin*

Di nav daristina/ birûyan de Zagros û Ararat/ gilî gazinan ji hev dîkin

Di gola çavan de/ pêlên Ormiye û Wanê/ westiyane

Her wiha ew dibîne ku kalemêrekî/ Jiyana xwe/ di tîzbîyekê de/ daye hev !/ Kalemêr/ her rojê.../ sed carî teneyên tîzbîyê bi ser hev werdike.../ û bûyerên dîroka xwe di wan de bîndike!

Ev pirtûk jî 110 rûpelan pêk hatiye, bergê pêşîn bi tabloyeke Mustafa Hebeş û bergê dawîn jî bi wêneyekî helbestvan hatiye xemilandin. Nîhat Gulê bi xêzên xwe nava pirtûkê xemilandiye. Pirtûk jî nav weşanên Janyar derketiye. Di pirtûkê zimanekî raman û xweşik hatiye bi karanîn, lê hinek xeletiyên rast-

HELBEST

QIRÎN




NEZÎR PALO

nivîsê balê dikişînin. Bo nimûne lêkera bûn digel navdêran hatiye nivîsandin, wekî mezine, xwîqa mine... Dîsa hinek lêkerên hevedudanî jî digel hev hatine nivîsandin wekî werdike, bîndike û hwd.

SAMÎ BERBANG

Du û didu

EDENÎ FERHO



Wekî tê zanîn zimanê kurdî di hêla yekbûnê de negihaye qonaxeke rêkûpêk. Di nava nivîskar, rojnamevan, derhêner, hozan, helbestvan, hunermend, wênekêş, xwendevan, gundî, bajarî, şifêr, karker û rêveberan de, di vê derbarê de her dem gengeşiyên têr galgal çêdibin. Lewre min gotinên di yek maneyê de nivîsin. Ya rastî ez, ji gengeşiya ku di warê tawanbariya heremî de tê kirin westiyame. Her kes gotin û axaftina herêma xwe diparêze. Ev parastin mafê her mirovî ye, lê ne bîngeha rastiyê ye. Bêguman navber û pêgîha ku zimanê kurdî li ser pişkiviye, tîrhik û kat daye, gihaye rêkûpêkiya berdanê ne hewqasî teng û bêwate ye. Zimanê kurdî jî, di qonaxa îroyîn de gihayê radeya ku dikare bersiva her hêlên zanistî bide. Mîna her destpêkê, ku di nava gelên cihanê de bûye, di pêkanîna zimanê me de jî wê hinek tengasî derkevin meydanê. Her wiha gengeşiyên zexim û hişk jî wê çêbibin. Lê, divê bête zanîn ku di karûbarê zanistî de, tu caran xal nayê danîn. Xisleteke derhêner û helbestvanê me yî berz Sefkan heye, ku tiştê got tiliya xwe dihejîne û xaleke qalîn datîne. Ez ne di wê hişmendiyê de me ku wiha be. Ji ber ku heger navê berê rezan, li hêla Çiyayê Hevêriya (Torê) tîrhik be, li hêla Amedê, yan jî herêmeke din tîrhik be, tîrhik be, rastî û çewtiya di navbera herêman de bi xaldanîne

mayê çareser kirin. Doktorê tiştên wiha dem e. Pêdiviya me bi nermî û guhdariya hev û din heye. Ji ber ku tu kes nikare bibêje ya herêma min rast e.

Ya girîng ew e ku nivîskar, rojnamevan, lêkolînan, dîrokan, siyasetmedar, wênekêş, derhêner, bi giştî binbarên avakirina wêje û çanda kurdî di hêla zimanê zikmakî de, têkevin nava hewldaneke berz. Qonaxa îroyîn di nava guhartinek nîgarî û têr şax û berên berz de ye. Bi daxwazên dîrokî re, daxwazên civakî hene. Daxwazên dîrokî jî daxwazên civakî cuda ne. Ji bilî ku em van daxwazan tevlihev bikin, kar jî me tê xwestin. Mîna her gelê li ser gerestêrka (gezegen) bi navê cihan, em jî nikarin ji van daxwazan birevin. Ev daxwaz jî bilî pêgîha kesayeti xwe di wargehên kûr û dorfireh de diyar dike. Ev daxwazên dîrokî, ji her du hêlan ve jî, daxwaza navekî hebûnê dîkin. Bi dilgermî û dubareyî vê daxwazê dike, heya bersivê nebîne, wê berdwam bike. Pêdiviya bersivê di vê qonaxa dîrokî de heye. Îro wext e, awaza bêdengiya di wateya xiloka mirinê de, dibe xwedî derketina li paşerojan ber bi pêşerojan. Hingî hebûna me dikeve nava çarçoveya dadmendî.

Çima bêzar e? Heger nivîskarekî ku bibêje ez kurd im û hewl bide ku çand û wêjeya kurdî jî pîpînkê deriyê mala xwe ber bi pêgîha gerdûnê bibe, divê ku bi kurdî biaxive, binivîse, zû ne dereng paşnavê xwe biguherîne. Lê heger ew nivîskar pirtûkên jî qama xwe mezintir bi zimanê tirkî, yan jî bi zimanekî din binivîse, kurdî nizanibe, hewl nêde da ku bi kurdî fêr bibe, du zimanê biyanî zanibe û cardin li mala xwe dersên zimanekî din ê biyanî bistîne ne duristî ye. Helbest zanîna zimanê biyanî sêdewariyek bîniqas e. Lê ji bo nivîskarekî kurd nezanîna bi kurdî û hewl nedana fêrbûna zimanê zikmakî şermazerî ye. Û bi rastî tawanbarî ye.

Ne seyr û ecêb e ku piraniya nivîskarên kurd paşnavên wan Bayrak, Taş û Uzun û Yîgît, Narli, Gündoğan û hwd. datînin. Gelo, ew erka berz ku di nava çewsandin û perçiqandina sedsalan de nav û paşnav û hest û mêjî û çand û wêjeya kurdî tarûmar kiriye, hê jî, ji hêla rewşenbîrên kurd ve bête berhembêzkirin, rewşek çawa derdikeve holê? Gelê kurd navê şerkêşê şoreşa kurd ya berz Abdullah Öcalan, kiriye kurdî û wilo berhembêz kiriye; Apo... Komên xelkê di nava xwe de van tiştan diaxivin û şîrove dîkin. Bi vê pêkanîne, komên xelkê li xwe xwedî derdikevin. Her wiha li mirovê ku berziya berxwedana neteweyî bi rêkûpêk kiriye jî xwedî derdikeve. Heger nivîskar jî xwe, ji mala xwe dest pê neke û nebe parezgerê ku navê gerîla jî bo zarokên xelkê bûne nişanî û her zaroka jî dayika xwe re dibe, navekî cangorîyan lê tê kirin, xwedî demekeve, pêşeroj bi berzî nayên avakirin, dastana civakî di nava hûnandina mîtolojîk de nayê lidarxistin. Ev jî ne bersivdana dijmin û dîrokê ye. Li hemberî ajîtyên dijmin ku temtêla têkoşîna gelê kurd ber bi tawanbariyê dibe, avakirin bend û rawestandina pêşbirkî li mirovên rewşenbîr e. Hingî bûyer jî hûnandina kronolojîk derdikevin û digihîne qonaxa tematîkî. Yanî dibine malê dîrokê û ji bo pêşerojan dibîne bîngeh. Her wisa nivîskar û ew çîne bijartî jî, ji binbarî û tawanbariya dîrokî derdikeve û karbendiya xwe tîne cih. Gotina dawî ev e; Pîrgirêka îro ne gotin û bêjeyên cureyî ne; guhartina me bi xwe ye. Pêşî em, xwe biguherin, da ku hûn bikaribin nof û komên xelkê biguherin û rêzantiya pêşerojan bikin. Em gotina Îliya Erenbûrg li gorî hinek nivîskarên tombala biguherin û bibêjin: Em di demeke wilo de dijîn ku nivîsandina li eniya gelê kurd, ne li gorî listîka tombala, li gorî hoyên listîka satrancê tê nivîsandin.

Mesixbûn

Şivan û şerê Gerîla



Sê-çar roj ji sersalê re mabûn; du mirovên Kerşafî ku li Nisêbinê rûdinin, Mele Brehîm û Hecî Ibêdîla ji hêla Midyadê keriyek elok distînin û tînin Nisêbinê da ku bifiroşin gel. Dotira rojê êş li elokan peyda dibe. Ango elok nexweş dikevin. Elok sist dibin, û av ji qulê pozê wan diherike.

Mele Brehîm dibêje: "Hecî Ibêd, ev elok nexweş in. Bi êşê ketine."

Hecî Ibêd dibêje: "Hiş... Careke din peyveke wisa neke. Gel pê bihese, wê elok di stûyê me de bimînin. Ez hecî, tu jî

mela yî. Gelê Nisêbinê bi me bawer e."

Ji ber ku gel bi wan bawer bû, elok gişk tene firotin. Lê berî ewara sersalê gelek ji wan dimirin. Bûyer li nav Nisêbinê deng ve dide, lê devê wan nagere ku bibêjin: "Ev her du mirovên bawerkar hîle li wan kirine. Elokên biêş firotine wan." Ango bûyer fetisê derbas dibe.

Osmanê Fermano li Îzmîrê bûyerê dibihîze. Piştî sê mehnan tî Nisêbinê. Di civateke de ku Mele Brehîm û Hecî Ibêdîla lê rûniştî ne jî Mele Brehîm re dibêje: "Min xewneke bi te dîtibû." Mele Brehîm

dinêje: "Xwedê xêr bike, kengî?" Osmanê Fermano dibêje: "Di nava xêrê de be, xêr e." Şeva din. Mele Brehîm dibêje: "Ma xewna te çi bû?" Osmanê Fermano dibêje: "Min dît ku li ber deriyê mizgefta Qışlê gelek mirov civiyane, min got qey bûyerekek çêbûye an jî xutbe ye. Ez jî çûm nav wan, ew mirov li du elokan civiyane. Li wan temşa dikin. Hinek gunehê xwe bi wan tînin. Hinek ji wan digotin xebînetan. Nestêle bûn.. Min baş bala xwe da elokê.. Wekî ku ez vê elokê dişibînim yekî. Wey wey... Kuro dişibe Mele Brehîm. Ez li dorê çûm û hatim, min dît ku teqez Mele Brehîm e. Min li ya din nêrî. Wekî ku ew jî bi min ne biyan dihat. Wekî ku ez vê jî nas dikim. Gelo kî ye? Dişibe kê...? Ez hatim di ser re sekinîm. Baş bala xwe didim elokê, wele ne biyan e.. Min dît ku elok di ber xwe de dibêje: "Ibêd Ibêd, Ibêdîla. Ibêd, Ibêd, Ibêdîla.." wey kuro, ev jî Hecî Ibêdîla ye. Min got: "Hecî Ibêd, Mele Brehîm hûn û ev hal? Çi bi we hatiye?"

Mele Brehîm nizanibû ku Osmanê Fermano şanogerek bi nav û deng e. Jixwe dizanibû ku li Îzmîrê dijî. Ma ji ku wê bi bûyerê hesiyabe. Xewna wî misoger dipejirîne. Hema li Hecî Ibêd dizivire û dibêje: "Ibêdîla, Xwedê wekîl e ji ber firotina wan elokên biêşê û nexweş Yezdanê dilovan ez û tu mesix kirine." Ji ber ku mele li xwe hate mikur, civat gişk bi wan dikene.

BRO Î. OMERÎ

Di sala 1990'î de refek gerîla derbasî hêla Gewaşê dibe. Heyanî wê demê tu gerîla neketibûn vê heremê. Li wir her çiqas hebûn û jiyana gerîla sehkiribûn jî, lê baş nas nedikirin. Rojê gerîla, piştî livbaziyekî dikin ku bi paş ve vebikişin herine niqteya xwe, leşkerê dijmin jî li ser vê rûdanê derdikewine operasyonê. Gerîla hêj negihîştine cihê xwe, şer di navbera wan û leşkeran de derdikeve. Gerîla hem şer dikin, hem jî xwe dikişînin cihê bilind; ji bo ku însiyatîfa şer bêxin destê xwe.

Dema şer dest pê dike, şivanek jî li ber pezê xwe ye. Şivan dema dengê guleyan dibihîze pezê xwe dihêle û ber bi gerîlayan ve direve û dibêje:

- Bavo, bavo we pez berî erdê hev û din daye, we jinên hev revandin, we mêr ji hev kuştine! Çi bûye di navbera we de? Çi qewimî ye?

Bi dengekî bilind diqire.

Dema gerîla nêzîkî şivan dibin jê dipirsin:

- Te xêr e Şivan?

Şivan:

- Ma qey hûn ne eşîr in ku hûn li hev û din didin ber guleyan.

BAKÎ ÖZBOXANLI
Girtingeha Bartnê

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (84)


XAÇEPIRSA

P	A	K	D						
H	K	M	E	T	F	Î	D	A	W
R	A	S	R	E	S	Î			
H	E	N	A	R	A	V	G	R	
J	R	E	V	Î	N	Î			
K	N	A	R	Î	E	N	Î		
N	T	S	N	E					
Y	X	E	T	Î	V				
B	A	N	Î	S	A				
Ç	A	V	Î	T	O	R			

Bersiva Xaçepirsa 82'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 84'an, Kasete Xanemîr (Welatê Rojê) ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Vazo	Ji keziyê mezinîr	Rojek	%50	Girêdayî îcrayê	Tipeke kurdi
Şehîdek (wêne)	Kûçik	Sembola florê	Heywanê navmalan	Qertafa neyîniyê	
Bêziman	1	Bi dimilki derve	3	Bi farisi av	Teyr
Cejn	Girêdayî iradeyê	Notayek		Arvan	
Genim lê tê heran	Helbestva neki farts	Cinavkek		Gelo	
hînan		Naverast	2	Semsûr	
Li diji sivik				Cihê fişa elektrîkê	
Oksîjen	4			Esmanê bêewr	
Metodik	Yê ku ava dike				
Hezkrin, dildarî	Xwarina sereke				
		Gir, nefret			



PEYVA VEŞARÎ



WELAT



EHM!!
VAYÊ HERKES
DIBÛNE...
HEVALÊN XWE YÊ
SUÇÊ ÎTIRAF
DIKE.

Hii!!
KEVOKA
AŞTÎ...

Destana şer û aştiyê ji nû ve tê nivîsandin

Konvoya Aştiyê ku roja 31'ê gelawê-jê bi xwepêşandaneke mezin ji Kadiköya Stenbolê kete riya Amedê, piştî ku li gelek cihan hate astengkirin, roja 1'ê rezberê ji Siwêregê hate vegerandin. Heyet bi vegerînê jî ji belaya hêzên dewletê riha nebû, li Enqereyê nehiştin ku heyet bi-keve nava bajêr, li ser vê yekê, delegasyona biyan, rê birî. Piştî demeke heyetê dawî li vê çalakiya xwe anî û konvoy kete riya Stenbolê. Li Gebzeyê dîsa riya konvoya aştiyê hate birin, li vir bi êrişeke hovane, 15 endamên heyetê hatin binçavkirin. Ji du heb biyanî, 13 jî rêveberên saziyên demokratîk bûn.

Li Stenbolê jî heyeta aştiwxaz digel ko-ordinasyona çalakiyê xwest ku civîna çapemeniyê li dar dixê, lê hêzên dewletê derdora Otela Pera Palasê ku wê lê civîn bihata li darxistin dagirkirin û nehiştin ku ew civîn pêk were. Piştî jî, li Mîm Otelê êriş birin ser endamên delegasyonê yên ku bi rojnamegeran sohbet dikirin, li vîr jî 24 kes bi lêdan hatin binçavkirin.

Li Amedê hovîti û berxwedan hebû

Gelê Amedê bi awayekî girseyî amadehiya pergînkirina konvoya aştiyê dikir. Lê hêzên dewletê hê di roja 31'ê mehê dest bi çalakiyên xwe kirin. Rojekê berî hatina konvoya aştiyê, hêzên dewletê avêtin ser malên rêveberên HADEP'ê û 8 kesên rêveber hatin girtin. Dîsa hêzên dewletê girtin ser gelek saziyên demokratîk û malên welatparêzan li wan deran jî gel kes hatin binçavkirin.

Roja 1'ê rezberê serê sibehê, piştî saet 8'an gelê Amedê ji bo pergînkirina konvo-

ya aştiyê li Meydana Batkentê dest bi civînê kir. Cara yekemîn di vê saetê de polisên robocop êrişî gel kirin û gel ji meydanê bi dûr xistin. Lê saet di 10:00'an careke din girsiyeke bi qasî du hezar kesî çembera polîsan qelastin û daketin meydanê. Hêzên dewletê îcar bi êrişeke tund gel ji hev belav kir. Piştî vê yekê bi panzeran û bi hêzeke mezin dora meydanê girtin. Gel jî li kolan û malên li nêzî meydanê civiyan.



Li Kooperatifên Batkent û Bayramoğlu, li taxa Seyrantepe, Huzurevleri, li kolana Hatboyu û Emek, li Koşuyolu, li hemû kolanên taxa Bağlaran gel li hev civiyabû. He-ta tariya êvarê ji hezarî zêdetir kes hatin binçavkirin. Ji bo ku gel nekeve meydanê polîsan sîleh teqandin. Esnafên taxa Bağlaran kepengên dikanên xwe girtin.

Jixwe çarmedorê bajêr ji nik hêzên dewletê ve hatibû girtin. Ev kesên ku ji bajarê din dihatin Amedê, bi paş ve dihatin vege-randin. sê heyet jî ku di nav wan de gelek kesên navdar hebûn û bi riya hewayê hatibûn Amedê ji balafirgehê hatin vege-randin.

Heyeteke biyanî ku ji heft kesên îtalî pêk hatibû, piştî ku hatin binçavkirin, polîsan bi heqaret û gefan ew birin balafirgehê, ji wir şandin Stenbolê.

Polîsên resmî û yên sivil, timên taybet tê-rê nekiribûn, gelek leşker jî anîbûn Amedê. Lê belê gelê Amedê jî bi berxwedana xwe da nîşan du ew bi dil û can li doza xwe û so-za xwe xwedî derdikeve.

Digel ewqas hovîti jî Wezîrê Karê Hun-dirîn mîna ku mirovên bixwe şûna debengan digot: "Heyetê mafê xwe yê azadiya gerê bi kar aniye, bêyî astengi ketiye Amedê. Li ali-yê din rayedarekî leşkerî ku navê xwe ve-şartibû, dida zanîn ku "aşti listika PKK"ê ye.

AZADIYA WELAT/STENBOL /AMED

balyoz: konsolos
baregeh: kamp
bawemend: murid
berz: bilind
çalak: aktîf, dînamîk
çeleng: ciwan, qeşenq
darbeşan: qayik, kelek
destdîreji: destkarî, mûdalaxe
dîrov: rûçik
dîdar: hevdiîn, danûstandin
efser: subay
erik: peywir, vatînî, wezîfe
gerdûn: alem

Ferhengok

gerestêrk: gezegen
guncan: mûsafîd (uygun)
hoy: merc, şert
karpêk: berheîn, afirîn, eser
kuta kirin: qedandin, xelaskirin
mandin: mayin
mijûlbûn: lêrabûn, pêdaketin
nepixandin: werimîn, perçivin
nolî: wekî, mîna, fena
pakrewan: şehîd
parinc: miz, mehî, meaş

parname: sehîm
pêgih: Saha, mekân
pêşwazi: Pêrgînî (karşilaşma)
pipînk: tûtîk (dûdûk)
qam: bejn
qefaltin: girtin
raz: sir (giz)
rêkûpêk: binîzamî
serkutkirin: vebirîn, qirkirin
seyr: balkêş, ecêb
sinc: ahlaq, etîk, cir
sûdewar: bikêr, bifeyde
şewirmend: mûşteşar

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90.13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jan Dost
Helîm Yûsiv

Berlin:
Silêman Sîdo
49 30 69 00 26 95

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Munchen:
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Stockholm:
Rôbin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
Ferhat Zebarî
31 104 85 55 48

Rojek bi Apo Osman Sebrî re

Kalemêr got: "Apo ma tê bîra te, di sala 1957'an de komûnîstan li bajarê Qamişloke meşek çêkirin û polîs hatin tu di mala de girtin û birin. Qeymiqem ji te re got: "Osman destê te di vê meşa li dijî dewletê de heye" û te lê vegerand û got: "Ger destê min tê de hebûya, ezê li pêşiya hemûyan bimeşiyama."

apo her dem digot: Xelkên pêşketî miriyên xwe vedijînin, xelkê me jî xweşên xwe dikin mirî, di gulana 1990'î de ez çûme serdana Apo Osman, demeke dirêj bû ku ez neçûbume serdana wî, gava ez derbasî xaniyê wî yê piroz bûm, min nihêrî dirûvê Apo yê ku min nas dikir gelek hatiye guhartin, hingî biçûk mabû, te digot qey qufikek e li ser têxt.

Çawa we ez dîtîm ta ku jê hat li ber xwe da û bi zehmetiyeke mezin rabû ser xwe û em çûn dev û rûyê hev û ji nû ve bi alikariya min derket ser textê xwe, belê dirûvê wî guharîbû, lê sinc û vîna wî tiştê neguharîbû. Hema dema mirov li çavên wî dinihêrî hêvî li pey hêviyê ava dibûn, ku çiyayên Kurdistanê di çavan de reng vedidan. Me hal û demên hev pirsî, gîlî û gazinek xwe ji kurdan kirin û li ser jiyana xwe axivî, êrişek tûj bir ser rewşenbîran, di pişt re deng li keça xwe Kewê kir û got: "Ka daktîloyê û berçavka min bîne." Du helbest bi dektîloyê nivîsandin û diyarî min kirin.

Helbestek bi navê nêviyê wî Siyamenî û helbesta din jî navê wî "Rewşenbîr" bû, tê de rexne li rewşenbîrên kurd dikir.

Ger ez biranînên xwe yê bi Apo Osman re tevan binivîsinim wê pirtûkeke hêja jê pêk were.

Mîr got: "Apo, mafîr (nexwe) ev tişt tev de di jiyana xwe de dîtine, çima te nenivîsandine."

Apo got: "Wê roja wê jî bê."

Ez vegeyriyam û min dîsa got:

"Rojekî mirovekî di xewna xwe de "Ezraîl" dît û gelek ji wî tirsîya bêyî ku

wî nas bike, lewre ji wî pirsî kir got: "Tu kî yî?"

Ezraîl lê vegeyriyam û got: "Ez mîrê mirinê me, ger daxwazên te hene ji min bixwaze."

Mîrov jê re got: "Xwezî berî ku ez bimirim tu xeberê bidî min." Ezraîl pê re soz berda ku daxwaza wî wê bi cih bîne.

Piştî mirov çend sal derbas kirin, careke din Ezraîl di xewnê de hat ba wî û got: "Amade be ez hatime canê te bistînim."

Mîrov jê re got: "Çima li gorî soza te bi min re dayî te yê pêş de xeber neda min?"

Ezraîl got: "Min gelek caran xeber da te. Porê te spî bû ew xeberek bû. Roniya çavên te qels bû xeberek din bû. Piştî te qorik bû dîsa xeberek bû. Diranên te weşîn xeberek bû û gelek xeberên din. Ma ezê hîn çî û bi çî rengî xeberê bidim te?"

Mîrov

got: "Belê

rast e, lê

mîxa-

bin min

qet nizanibû."

Ez vegeyrim min got: "Apo Ezraîl gelek xeber dane te jî ma tuyê kengî binivîsî?"

Apo heta jê hat kenîya û got: "Ka were tenîsta min û careke din çîroka wî mirovî ji mir re bibêje." Mîr jî xwesteka wî pêk anî, pê gelek kêfxweş bû û Apo Osman vegeyriyam û got:

"Apo, gelek tişt min nivîsandine, piştî mirina min wê werin belavkirin."

Îro jî dîsa gotina nemir Apê Osman tê bîra min, digot: "Xelkên pêşketî miriyên xwe vedijînin û em ji xweşên (zindî) xwe dikin mirî."

Ez bawer im Apê Osman gelek nivîsar û belge parîştibûn ku ta ew bimire baweriya xwe bi hin kesa kiribû, ku ewên nivîsarên Apo belav bikin. Lê mixabin ew tiştên Apê Osman digot nehatine belavkirin.

Em bi hêvî ne yên ku tişt û nivîsarên Apê Osman li ba wî ne, temiya Apê me bi cih bîne. Çimkî ew apê kurdan tevan e.

Dema vê dîtina



min bi Apê Osman re dikir, min kir ku ez jê xatir bixwazim, min dît du mirovên kalemêr bi hundir ketin, yek jî wan di derî de rawestî li Apo mêze kir û got: "Ma ev Apo ye...! Heyf-heyf û mixabin ku Apê me yê wisa bibe." Çiqas wî mirovî li Apê Osman mêze kir ew qas jî digot: "Heyf û heyf, ta ku Apo rabû ser xwe û wî mirovî xwe avêt dev û rûyê Apo û careke din got heyf û bi Apo re got: "Apo ma te ez nas kirim?"

Apo serê xwe bada û got: "Na."

Wî dest di stûyê Apo re bir û bi hêrs giriya.

Lê giriye kalan bi ser hev de ne hêsan e, me ew hêdî kir, lê hêstirên me ji hêstirên wan bêhtir barîn.

Hin kalemêr destê Apo berneda û rûnenişt.

Kalemêr got: "Apo ma tê bîra te, di sala 1957'an de komûnîstan li bajarê Qamişloke meşek çêkirin û polîs hatin tu di mala de girtin û birin. Qeymiqem ji te re got: "Osman destê te di vê meşa li dijî dewletê heye" û te lê vegeyriyam û got:

"Ger destê min tê de hebûya, ezê li pêşiya hemûyan bimeşiyame. Û ger ez di pêşiya wan de bimeşiyama yên wekî te yê nikaribûna bigihîştana wê meşê û ji hev belav bikirana, ger bigihîştana jî minê pêl serê wan bikira.

Apo got: Belê...belê..

Kalemêr got:

Ma tê bîra te, gava em ji ba Mele Mîstefa Berzanî vedigeriyan, qeymiqem Zaxoyê em girtin.

Gava te bersiv dayê, ji te re got: "Tu mirovekî derewkarî, ger ez şemaqekê li te bidim, ezê diranekî di devê te de nahêlim, bi wê gefa wî re, te şeqamek da devê rûyê qeymiqem û lêda", Apo got: "Belê...belê.."

"Min wisa kir ji ber ku berî ew çavê min bişkîne, diviyabû min çavên wî bişkandana." Piştî wê hevpeyvîna di navbera wan de. Apo got: "Meleyê tûj î" û ji min ve dest di stûyê hev re birin û dan giriyan.

Her rûniştinek bi Apê Osman re biranînek e, ger em çiqas li ser mîranî, zanabûn pêşengî, paqijî, perwerî û welatî mîletparêziya van kesên ji ser xetê daktîntin bin xetê yên mîna Apê Osman, Mîr Celadet Bedirxan, Kamiran Bedirxan, Nûredîn Zaza, Mele Hesên Hîşyar Qedîr Cemîl paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Qedîrîcan, Nûrî Dêrsimî, Mehdûh Selîm Beg, Cêgerxwin bibêjin, bi dawî nayê.

Lê ew merdîya wan îro em nizanin ku de çûye.



M. Hemo bi Apo Osman Sebrî re